

# 'BES E, BI TIRKÎ NEAXIVIN'

**Li Êlihê dayikan helwesteke di cih de û watedar nîşanî kesên ku bi tirkî 'em pergala konfederalîzm û xweseriya demokratîk nîqaş bikin' dan û xwestin bi kurdî biaxivin**

BDP'a Êlihê di çarçoveya civînên "Em pergalên konfederalîzmê û xweseriya demokratîk nîqaş bikin" de civîn pêk anî. Civîna ku di dîwanê de Endamê PM'ê ya BDP'ê Mehmet Baysal, Cîgira Şaredarê Êlihê Gulîstan Akel, Rêveberê Tum Bel Sen'a Êlihê Alî Saripinar cih digirt, delegasyonên Meclisa Bajêr beşdar bûn. Di serî de Baysal, der barê pergala konfederalîzmê de agahiyên kurt da. Piştre jî Alî Saripinar jî, li ser sînevizyonê divê pergala konfederalîzmê û xweserbûnê çawa bê avakirin, bi zimanê tirkî vegot. Ji ber vegotina pergala konfederalîzmê û xweseriya demokratîk bênavber bi zimanê tirkî hate vegotin, bu sedema nerazîbûna dayik û bavên ku nizanibûn bi tirkî. Balkêş e ligel van nerazîbûnan jî civîn dê 3 rojan bi tirkî bidome.

www.welat.com

# Rojeva Welat

29 Îlon 2010 Çarşem Buha: 50 Kr Hejmar: 22 E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Ewlekarî, qinyat û bawerî

Pêvajoya aştî û çareseriya pirsgirêka kurd (!) dest pê kiriye. Lewma her kes dibêje, pêvajo girîng e. Girîngiya pêvajoyê jî, ji talûkeyê tê. Çi ye ev talûke, faşîzm. Di pêvajoyên wiha de; lîstik û xapandin, dek û dolab pir çêdibin. Di cîhana modern de, navê têkiliyên bi vî rengî wek 'dîplomasî' têne binavkirin. Dek û dolabên têne kirin jî, wek 'manewrayên dîplomatîk' têne binavkirin... ***Medenî FERHO*** ***R:2***



## Çîroka vejîna 20 salan e

Navenda Çanda Mezopotamyayê di demeke zext û zordariyên herî dijwar li ser kurdan û çanda kurd pêk dihat hate avakirin 20 sal li pey xwe hişt. NÇM'ê 20'emîn salvegera xwe pîroz dike. NÇM, ku di qadên muzîk, şano, sînema û dansê de xebatan dimeşîne armanc dike ku xebatên mezintir bimeşîne û heta niha gelek kes gihandine... ***RÛPEL - 11***



## Ji Azadiya Welat hîn bûn

Welatiyê bi navê Îdrîs Yaşar ê li Bêgîriya Wanê rûdine bi xêra Azadiya Welat hînî xwendin û nivîsandinê bû, niha li mala xwe kurdî hînî hevser û zarokên xwe dike. Yaşar, diyar kir ku li hemberî bêtehmûliya li dijî ziman û çandan ew hînî xwendina kurdî bûye... ***R.3***

## 'Awazên Stenbolê'

**Derhênerê belgefîlma bi navê 'Close Up Kurdistan' Yuksel Yavuz, vê carê jî gelên ku li Stenbolê dijîn, derdixe pêşberî temaşevanan. Di belgefîlma bi navê 'Awazên Stenbolê' de muzîka kurd, ermenî, romen, yahudî, rûm û ermenî balê dikişîne. Her wiha Yavuz nêzîkatiya li hemberî van gelan jî di belgefîlmê de bi awayekî vekirî derdixe pêş...** ***RÛPEL - 11***

# Zimanê hikûmetê pirsgirêkê kûr dike

Daxuyaniyên dewleta tirk û hikûmeta wê ji çareseriyê wêdetir pirsgirêka kurd kûrtir bike. Li aliyekî dibêjin ew ê pirsgirêkê çareser bikin, lê li aliyê din li Amerîka û Ewropayê digerin, diçin Iraq û başûrê Kurdistanê

### DIVÊ DEWLETA TIRK CIDÎ NÊZÎ MIJARÊ BIBE

Ger çareserî tê xwestin, divê cidîtir bin. Di çareseriya pirsgirêka kurd de divê gava yekem; dest jê berdana armanca qirkirina çandî-zimanî û desthilatdariya siyasî be. Pêwîst e Enqere ji bo dilûcaniya xwe bipeyîtîne vîneke ramyarî ya cidî destnîşan bike. Piştre dikare diyalog û gotûbêj dest pê bikin.

### ALIYÊ PIRSGIRÊKÊ KURD Û ENQERE YE

Berî her tiştî divê Tirkiye di warê çareserkirina pirsgirêka kurd de ji hêzên derve û ji welatên herêmê, dev ji alîkarî xwastinê berde. Aliyên pirsgirêkê, kurd û Enqere ye. Divê Enqere destpêkê aliyê kurd serwext bike. Her wiha hêza aliyê kurd heye ku di diyalog û gotûbêjan de pêşniyariyên çareseriyê pêşkeş bike... ***RÛPEL - 8***

## Heke jêwarê 3'yemîn jî nebe

Hêj nav li vê pêvajoyê nehatiye kirin. Hûn bêjin; 'diyalog' ne diyalog e. Hûn bêjin 'muzakere' ji xwe qet ne muzakere ye. Ji ber hindê qonaxa berveçûyîna muzakereyan, mimkûn e ku bê gotin. Di vê pêvajoyê de çi bê kirin dê pêvajoyê ber bi aştiyê ve bibe serî?... ***Adil ZOZANÎ*** ***R.5***

# Greva ji bo girtiyan didome



Îro li girtîgehan zêdetirî 50 girtiyên bi nexweşiyên giran ketine hene. Li hemberî vê rewşê ji bo hestyarî çêbibe malbatên wan dest bi greva birçîbûnê kir

Greva birçîbûnê ya ji aliyê Diyar TUHAD-DER'ê ve bi armanca balkişandina ser rewşa girtiyên nexweş û binpêkirina mafên di girtîgehan de li Parka Koşuyoluyê duh hate destpêkirin ket roja 2'yemîn. Xizmên girtiyan û 50 kesên tevli grevê bûne şeva xwe di kon de derbas kirin. Welatiyên hatine serdana çalakgeran jî piştgirî da wan. Malbatan, bang li rêxistinên civakî yên sivîl kirin ku piştgiriyê bidin çalakiya wan. Greva birçîbûna malbatan a dorveger îro dewrî koma duyemîn dibe. Greva birçîbûnê ya malbatan dê 6 rojan berdewam bike... ***RÛPEL - 3***

## Provokasyoneke din: 10 meh ceza dan Demîrtaş

Ji aliyekî ve behsa çareseriya pirsgirêka kurd tê kirin, lê li aliyê din ceza li berpirsê kurdan tê birîn. Ji Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş re ji ber axaftina wî ya di Roj TV'ê ya sala 2007'an de bi hinceta "propagandaya rêxistinê kiriye" 10 meh ceza hate birîn. Parêzera Demîrtaş, Meral Daniş Beştaş biyarê wekî "cudakariya di hiqûqê de" nirxand û got biryar "Eyba hiqûqê ye"... ***RÛPEL - 5***

## Yekitî bi pêşengiya jinan pêk tê

Gerîlayên jin ên PKK'î amadekariyên 2'yemîn Konferansa Jinan a Neteweyî nirxand û diyar kir ku ji bo Kongreya Neteweyî ya Kurd konferansa 2'yemîn a jinan merheleyeke girîng e. Der barê amadekariyên konferansê de gerîlayên jin ên PKK'î nêrînên xwe anîn ziman. Gerîlayên jin destnîşan kir ku fikr û ramanê jinên kurd çi dibe bila bibe, divê azadiya cinsiyetan esas bigire û li dijî vîna mêr tevli konferansê bibe. Jinan diyar kir ku ji bo bilindkirina têkoşîna azadiya jinê konferansa neteweyî ya jinên kurd rolek girîng dilize. Gerîlayan, destnîşan kir ku li her çar parçeyan kurd ji bo yekitiya neteweyî amade ne... ***RÛPEL - 7***

www.arsivakurd.org

# Wêrekî ferz e

## Mafê hemû kesan heye ku daxwazname bide hemû saziyên dewletê û ew meqam ferz e ku daxwaznameya wan kesan bigire, binirxîne û bibersivîne. Divê hikûmet çêker be, ne xirabker

ADIL QAZÎ

Pergala tirk di hemû kar û kêşeyên xwe de tirsonek e. Ji ber wî jî dualî nêzîk dibe. Weke; ku min rast got û ez têk çûm! An jî lê ku min erê kir û êdî dawî li daxwazan nehat hwd. Weke van pirsan mirov dikare zêde bikin hene. Yanî ser û binê pergalê tirs û xof e.

Ew jî ji bo desthilatdariya xwe ye. Ji her tiştî re bi niyet nêzîk dibe. Di dilê xwe de rehet nîne. Lewra dilê wî reş e. Bi dev dibêje her kes birayê hev in lê di pêkanînê de tu car xwe nade ber rastiyan. Ev nêzîkahiya wê ya bi guman û dualî jî tiştekî çareser nake. Her ku diçe pirsgirêk kûrtir û kêşe aloztir dibin. Yanî barê xwe girantir dikin.

Ev di serî de ne sûcê hikûmetên ku têne ser kar in belkî, ji ber ku; weke tê zanîn 'her kes dikare bibe hikûmet (li gorî rê û rêbazan) lê tu carî nebûne desthilatdar'. An jî nikarin bibin desthilatdar. Ev nêrîneke gelemperî û paya rastiyê tê heye. Biwêjeke kurdî heye 'ger ku mirî bi rehm be gor fireh e' tê gotin. Di vê gotinê de hemû tişt veşartî ye. Her çende her hikûmet nikaribe sedî sed tiştan biguherîne jî lê ku hikûmet yek partî be hinek tiştan dikare pêk bîne. Mesele xwesteka dil e. An jî emelê wî mirî ye. Ku birastî jî bixwaze tiştina bike rê û dirbên wî jî heye. Lê wêrek nîne.

Ya duduyan jî bi xwe dil reş e. Nexwe, ji her alî va piştgirî jî heye. Weke di Kêşeya Kurd de, di hefteya dawî de, ku wehdê bêçalakîtiyê bidawî bû û dîsa hefteyekê jî hate dirêjkirin yek ji ruknê dewletê MÎT'ê bi daxuyaniyeke hinek rastî û tiştên pêwîst anî ziman. Ev bi xwe re hêviyeke jî çêkir. Diviyabû hikûmet vê gavê xurt bikira lê derkete holê ku hikûmet bi xwe asteng e.

Weke hevdîtina bi Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan re ev du hefte ne asteng dike. Çav li rê bû ku zêdetir derfet bihata dayîn ji bo hevdîtina bi Rêber Ocalan re, lewra her kes jî dizane mifteya çareseriyê di wir de ye. Lê mixabin berovajî tişt diqewimin. Dîsa, ji bo boykotkirina hefteyeke dibistanan diviyabû ev weke derfetek ji xwe re binirxandana, lê Serokwezîr ji hevrikên xwe hevriktir bû. 'bila tu kes ji min hêviya perwerdehiya bi kurdî neke'. Bi vê axaftina Erdogan pêşî li riya daxwaznameyan jî hate girtin. Ev tirs û xofeke dide xuyakirin. Naxwe çi ye? Ev xeteriyeke faşîzan e. Li tu derê cîhanê, hela di welateke ku bi komarî tê birêvebirin de sosreteke wiha nîne. Her çi dibe bila be navê wê li ser e DAXWAZNAME ye, yanî hinek tişt têne xwestin. Tu didî nadî ew di destê te de ye, lê wergirtina daxwaznameyan (naverok çi dibe bila be) ferz e. di nava komarekê -dewletekê- de du zagon nabe. Lê li Tirkiyeyê ev tiştekî asayî ye! Weke cudahiya navbera hemwelatiyan cudahiya navbera bajaran jî tê kirin. An haya wan ji hevdu nîne, an jî ew bajar bi serê xwe tevdigerin. Weke bajarê Amedê şaxê gerînendehiya perwerdê ya Baglar û Kayapinarê qet tu sedem nîşan nade û daxwaznameyên malbatan wernagire. Ji ber ku ji devê serokwezîr Erdogan ew gotin sehkirine êdî pêwîstî bi xwendina daxwaznameyê jî nabînin yekser red dikin. Ev tê çi wateyê: ev, di înkar û tunekirinê de îsrarkirin e. Ev faşîzm e. Yanê siltanetî ye.

Gelo ev destûra bingehîn ku da dengdanê ji bo Siltanetiya Erdogan bê erêkirin bû? Ku bi siltanan demokrasî pêk bihata hewce nedikirin bi milyonan mirov jiyana xwe ji dest bidana. Ew dem derbas bûye. Divê em baş hevdû fêm bikin. Ji bo fêmkirinê jî divê guhdarîkirin hebe. Mafê hemû kesan heye ku daxwazname bide hemû saziyên dewletê û ew meqam ferz e ku daxwaznameya wan kesan bigire, binirxîne û bibersivîne. Divê hikûmet çêker be, ne xirabker. Ev hewldanên vê gavê di her warî de jî ber bi xirabiyê ve diçe. Hebekî wêrekî hebe çareseriya gelek pirsgirêkan jî gengaz e. Bes zimanê me qufil meke.





Medenî Ferho
medeniferho@hotmail.com

## Ewlekarî, qinyat û bawerî

Pêvajoya aştî û çareseriya pirsgirêka kurd (!) dest pê kiriye. Lewma her kes dibêje, pêvajo giring e. Giringiya pêvajoyê jî, ji talûkeyê tê. Çi ye ev talûke, faşîzm.

Di pêvajoyên wiha de; lîstik û xapandin, dek û dolab pir çêdibin. Di cîhana modern de, navê têkiliyên bi vî rengî wek 'dîplomasî' têne binavkirin. Dek û dolabên têne kirin jî, wek 'manewreyên dîplomatîk' têne binavkirin. Ev çiqasî etîk e gelo?

Rastiya wê xapandin e, hîle ye, dek û dolab in. Di encamê de bêbextî ye. Dî dîroka kurdan de, mînakên vê yekê pir hene. Mixabin ev mînak jî bi kuştin û koçberiyê hatine neqişandin. Her neqşa kuştin û koçberiya kurdan, hejmara şêniya tirkîtiyê zêde kiriye. Xiyanet hinekî din kûr û fireh kiriye.

Pergaleke ku tenê dikare bibe rûreşî ye ev. Lewma di baskên edebiyatê de cihekî giring girtiye. Destan, helbest, çîrok, roman û teatro cihekî giring daye vê rûreşiyê. Di teatro de Shakespeare, di destanan de Homeros û Ehmedê Xanî, mînakên balkêş dane. Ji sedema ku romannivîsan şer, kuştin wek bêbextiya li hemberî mirovaniyê nirxandiye, xiyanet jî parçeyek ji şer nirxandine. Guman dikim ku şaşiyek mezine ev. Romannivîsên cîhanê, ji Shakespearê dersên giring nestandine. Ji ber ku Shakespeare, xiyanet wek kurmê di nava xwînê de nîşan daye. Hisyenê Ferho jî, digot, "kurmê xiyanetê bi xwînê tê xwedîkirin, pêwiste xwîn bê paqijkirin. Bersiva wê jî dida û digot: Xwîn xwînê paqij nake, xiyanet jî bi kuştinê ji holê ranabe, dive ku mêjî bê şûştin." Ev navê perwerdehî û xwendinê bû... Lewma serokwezîrê Tirkiyeyê dibêje, "perwerdehiyê ji bîr bikin." Û dergehê talûkeya mezin vekirî dihêle.

Ehmedê Xanî jî, dema Destanê Memê Alan girtiye destên xwe, xiyaneta Beko Ewan derxistiye pêş û xetbizêrên ku îro di guhên me de bûne guher, nivîsî ne. Hêvî dikim ku nivîskarên kurd, rewşenbîrên kurd giringiya xiyanetê û wateya xiyanetê û xeta xiyanetê baş nas bikin.

Ji ber ku, kesên ku lûtên ketiyê devê tenûra dagirkeran dixwin jî, bi awayekî bêşermî, dibêjin 'ez jî kurd im' û dixwazin, di pêvajoya çareseriyê de, bexilî û bextreşiya bi dek û dolaban dagirtî sergirtî bikin. Gelek stratejîsyen û siyasetmedar dibêjin, "di pêvajoyên aştiyê de, hêzên kûr, dikarin provkasyonan bikin û pêvajoyê sabote bikin". Ne tenê hêzên kûr, hêzên tenik jî dikarin pêvajoyê sabote bikin. Ji ber ku hêzên tenik, ewrên reş li xwe dipêçin û wek marên kor, derdikevin nêçîrê.

Di kanalên telewizyonên tirkan de, ev hêzên tenik, ku bi 'lûtên ketiyên devê tenûra AKP'ê xwedî dibin' her roj xuya dikin û rola BEKO EWAN dilîzin. Lewma pêvajoyên aştiyê giring in û ewlekarî, qinyat û bawerî şertê sereke ne.

Sê gotinên ji hev cuda ne, lê di qonaxekê de digihine hev.

Qinyat, binyata baweriyê ye; bawerî jî çavkaniya baweriyê ye. Lê ev her du gotin jî pêdiviyê bi ewlekariyê tînin. Ewlekarî dengeya hêzan e û qinyat û baweriyê li ser lingan dihêle.

Di demeke ku hêzên tenik (kurdên spî) di nava tevgerê de ne û dixwazin rola Rehberê Dêrsimî bilîzin, wezîrê karên hundir yê Tirkiyeyê Beşîr Atalay çû Herêma Federal a Kurdistanê û niha jî wê Serokê MÎT'ê Hakan Fîdan biçe herêmê. Ji aliyê din ve hêzên leşkerî li ser tixûbê başûrê Kurdistanê ha ha kom dikin. Ev talûke ye.

Eger qinyat û bawerî neyê dayin, hingî talûke wê rola xwe xerab bilîze.

Desthilatdariya AKP'ê, di civînên rewşenbîr, nivîskar û hunermendan de, yek nivîskar, rewşenbîrê kurd vexwendî civînan nekir. Wezîrê karên hundir Beşîr Atalay çû Amedê, hinek hevdîtin pêk anîn, bi Komeleya Nivîskar, bi rojnamevanên kurd re hevdîtin nekir. Dema ku Beşîr Atalay qinyatê nedê û baweriyê pêkneyîne. Talûke dest pê dike.

Desthilatdariya AKP'ê, ji destpêkê dest bi propagandeya kir ku wê gerîla derkevê derî sinor. Kê biryar da, kengî hate gotin, li ser kîjan esasî AKP bi riya çapemeniya xwe, vê ragihandinê dike? Ev tê wateya ku çavên AKP'ê li dek û dolaban e. Car din, gerîla derxin derî sinor û operasyona bi desteka hêzên navneteweyî jî di nav de, her cure êrîşên kujerî û "mel'anet" bikin pratîkê. Ev talûke ye.

Ji ber ku terora dewletê ya li ser siyasetmedarên kurd û girtina wan bi awayekî dijwar didome. Ev talûke ye.

Di pêvajoya aştiyê de, serokwezîr dibêje "perwerdehiya bi zimanê zikmakî ji bîr bikin". Ev talûke ye. Pêşxistina kultura lîncê û desteka kolanan a li pey desthilatdariya AKP'ê, talûke ye. Ev tevan rengê faşîzma ku dixwazin, di nava demê de dora kurdan bipêçin û darbeya dawî deynin.

Rastgiriya tirkan, çepgiriya tirkan têk bir, niha îslamgirî jî, bi rastgiriya tirkî çok berdane erdê. Duh rastgiriyê, îro îslamgiriyê Artêşa Tirk li hemberî kurdan bi kar tîne. Ev talûke ye.

Talûke ne tenê li hundir, li derve jî tora xwe dihune. Mekanîzmeya sêalî çerxa xwe dizivîrîne û heyetek Amerîka wê werê Tirkiyeyê. Beşîr Atalay jî destnîşan kir ku ev heyetek wê ji bo têkiliyên bî wî re werê Tirkiyeyê. Ew kî ye, koordînatorê tasfiyekirina Hereketa Azadiya Kurd e. Ev talûke ye.

Hejmara talûkeyan, ji hejmara qinyat û baweriyê bi egelekî zêdetir e.

Faşîzma tirkîtiyê talûkeyeke mezin e, zirav dirêse û qinyatê nade, baweriyê jî dikuje.

## XAÇEPIRS

**Ji çepê ber bi rastê ve**

**1.** Karker... Danekî rojê **2.** Cînavka şexsê sêyemîn ji bo rewşa netewandî... Hesinê ku li binê piyê hespan dixin... Peyveke teşwîqkirinê **3.** Kesê ne mirî... Ji pêncan yek zêde **4.** Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye... Cama mîkroskopê **5.** Agir... Nedirêj, kurt **6.** Îşaret, şop... Tîpên navîn ê "saet"ê... Kurtebêja otomobîlê **7.** Rutbe... Di zimanê zarokan de lêxistin **8.** Beşeke malê, jûr... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin **9.** Kesê ku cil û berg lê nîn e... Xwarinên ji şîr

**Ji jorê ber bi jêrê ve**

**1.** Nasîhet, şîret... Cureyekî sebzeyên tuj ku rihayî pir jê hez dikin **2.** Bi soranî 'av'... Sir, tiştê her kes pê nizane... Bi rûsî erê **3.** Dijbera germ... Keriyê mî û bizinan **4.** Sureyek Quranê... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê **5.** Baneşana keserê... Muxtar **6.** Eşîr, qebîle, hoz... Xanedana qraliyeta Vîetnamê... Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê **7.** Tiyatro... Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Yezdan ve hatiye tunekirin **8.** Li gorî baweriyên olî mirovê ku ewilî ji layê Xwedê ve hatiye afirandin û pêxemberê pêşîn... Rastêşek **9.** Dijberê rengî spî... Raman, fikr, hizr

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Ş | O | P | ■ | S | A | T | O | R |
| 2 | ■ | D | Î | Z | ■ | J | Î | R | ■ |
| 3 | R | E | ■ | O | T | O | ■ | S | S |
| 4 | E | ■ | Ê | ■ | O | ■ | N | A | ■ |
| 5 | N | A | M | E | ■ | A | E | ■ | A |
| 6 | Î | Z | ■ | W | E | R | G | E | R |
| 7 | ■ | M | A | K | ■ | D | O | ■ | Î |
| 8 | K | Û | P | ■ | T | ■ | T | E | ■ |
| 9 | Î | N | ■ | Z | A | Y | Î | Ç | E |

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | ■ | | | | | |
| 2 | ■ | | | | ■ | | | | ■ |
| 3 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 4 | | ■ | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 5 | | | | | ■ | | | ■ | |
| 6 | | | ■ | | | | | | |
| 7 | ■ | | | | ■ | | | ■ | |
| 8 | | | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 9 | | | ■ | | | | | | |

ROJEVA WELAT
Zozan Basın Yayın Adınaİmtiyaz Sahibi:
Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Sevim KAPLAN

Yönetim Yeri:
Diclekent Bulvarı
Termil Apt. Kat:3 No:9
Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
TEL: 0 (412) 237 48 90-91
Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı (ÇAP):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti.
Telsizler Mevkii Beşyol Mah. Akasya Sok. No: 23/A
Küçükçekmece / İstanbul
Tel: 0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtcılık A.Ş
İstîklal mah. İstîklal. Cad.
No: 44 Seyhan / Adana
Yaygın süreli yayındır.

www.arsivakurdi.org

# Bi riya rojnameyê hînî kurdî bûn

Welatiyê bi navê Îdrîs Yaşar ê ku li Bêgîra Wanê rûdinê bi xêra Azadiya Welat hînî xwendin û nivîsandinê bû. Yaşar niha li mala xwe zarok û hevserê xwe jî hînî nivîsandin û xwendina kurdî dike

**WAN / DÎLOK - DÎHA** - Welatiyê bi navê Îdrîs Yaşar ê li mezraya Gewrîkê ya navçeya Bêgîrê rûdine bi xêra Azadiya Welat hînî xwendin û nivîsandinê bû, nîha li mala xwe kurdî hînî hevser û zarokên xwe dike. Yaşar, diyar kir ku li hemberî bêtehmûliya li dijî ziman û çandan wan ew hînî kurdî bûye bi heman armancê zarokên xwe jî bi kurdî perwerde dike.



Welatiyê bi navê Îdrîs Yaşar, anî ziman ku ew neçûye dibistanê û hevsera wi jî wekî wî neçûye dibistanê û hînî kurdî bûn. Yaşar, da zanîn ku hevsera wî Nurcan Yaşar xwendina kurdî hînbûye lê tirkî nizane binivîse û bixwîne. Yaşar, bilêv kir ku zarokên wî Rojîn û Azat serê sibê diçin dibistanê piştî jî dibistanê tên malê jî hînî xwendin û nivîsandina kurdî bûne. Yaşar, destnîşan kir ku piştî 2 sal berê Azadiya Welat hate Bêgîrê dest bi xwendina wê kirine û hînî kurdî bûne. Yaşar, daxuyand ku piştî Midûrê Karên Nivîsê yê berê yê Azadiya Welat Vedat Kurşun 166 sal ceza girtin ew ji bo na hînbûna kurdî hêj bi hêz bûne. Yaşar destnîşan kir ku zarok zûtir hînî kurdî bûne.

**Bi hînbûnê bersiv dan**

Yaşar, diyar kir ku wan bersiva bêtehemûliya li dijî zimanê wan dane. Yaşar, bang li hemû dayik û bavan kir ku dibistana herî mezin ya zimanê kurdî mal e. Nurcan Yaşar jî diyar kir ku ew 3 meh in bi xwendina Azadiya Welat hînî kurdî dibe û pêşveçûnekî gelek mezin nîşandaye. Yaşar, anî ziman ku ew tirkî nizane binîvîse û lê hînî xwendina kurdî bûye.

**Li Dîlokê teklîfa sixûriyê**

Xebatkarê Azadiya Welat ê Dîlokê Çetîn Açikgoz ji aliyê polîsan ve hat tehdîtkirin û hat xwestin ku sixûriyê bike. Açikgoz serî li ÎHD'a Dîlokê da.

Xebatkarê rojnameya Azadiya Welat Çetîn Açikgoz hefteya borî li taxa Duztepe dema rojname belav dikin rastî gefa polîsan hat û polîsan xwest ku sixûriyê bike. Açikgoz anî ziman ku polîsan pêşiya wî birîne, pirsa nasnameyê kirine û piştre jî bi dest gef xwarinê kirine. Açikgoz wiha got: "Polîsan got li rojnameyê nexebite were cem me bixebite. Min qebûl nekir. Çek rakirin gotin em ê te bikujin. Min jî got ji bilî kuştinê hûn nikarin tiştekî din bikin. Polîsan got tu diçî BDP'ê û tê. Li wir çi dibe ji me re bibêje em ê alîkarî bidin te."li ser van pêkutiyan Açikgoz serî ÎHD'a Dîlokê da.

# Polîsan teklîfa sîxûriyê lê kir

**ÎZMÎR** - Li Îzmîrê xebatkarê BDP'ê Ceylan Kiziltepe, diyar ku polîseke sivîl ji wê re gotiye "Tu saf î, te dixapînin. Biçe mala xwe, cem malbata xwe. Çavderiyê bike ku di BDP'ê de çi dibe û ji me re bibêje. Em dê gelek pere bidin te." Kizilpete, li ser vê yekê serî li ÎHD'a Îzmîrê da.

Li Îzmîrê xebatkara BDP'ê Ceylan Kiziltepe ya 20 salî, diyar kir ku polîsan ji wê xwestine ku bibe sîxûr. Kiziltepe, da zanîn kir ku polîsan di 20'ê îlonê de bavê wê Rifat Kiziltepeyê di înşatê de dixebite ji wê derê girtine, qehwexaneyekê û ji wî re gotine: "Xwedî li keça xwe derkeve. Riya wê riyeke xerab e. Dê keça te bixapînin. Dê bixin bar û pavyonê. Ya di bikeve girtîgehê yan jî dê bişînin çiyê. Em ku derê wê bibînin em dê bigirin. Tu jî guneh î. Zarokên te yên dixwînin hene, baldar be."



Piştî ku polîs bi bavê wê re axivî, Ceylan Kiziltepe di 22'yê îlonê de çû Selçukê cem malbata xwe. Kiziltepe diyar kir ku piştî çuye cem malbatê bavê wê ku bi destê xwe ew radestî BDP'ê kiribû nehiştiye vegere Îzmîrê û derî li ser wê radaye. Kiziltepe, got ku li cem malbatê kurê meta wê jî gefên mirinê li wê kirine û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ez ji malê derketim û bi trênê hatim Îzmîrê. Di gara Basmaneyê de kesekî ku got 'Ez polîs im' bi milê min de girt û ez birim cafeteriyaya garê. Wê derê nêzî 2 saetan bi min re axivî."

Kiziltepe, anî ziman ku polîs her tim der barê rêveber û kesên dihatin BDP'ê de pirs ji wê kirine û wiha domand: "Ji min re got 'Tu saf , dê te bixapînin. Biçe mala xwe, cem malbata xwe. Çavderiyê bike ku di BDP'ê de çi dibe û ji me re ragihîne. Em dê gelek pere bidin te. Dê belayekê bînin serê te." Kiziltepe, di berdewama axaftina xwe de got ku heman polîsî ji wî re gotiye, "Sirri Sakik sixûrê dewletiyê ye. Rewşa Emîne Aynayê tarî ye. Hemû li ser pişta we dewlemend bûne" Kiziltepe, destnîşan kir ku polîs her tim xwestiye bi wê re hevdîtin pêk bîne lê wê nexwestiye û ji wê derê dûr ketiye. Kiziltepe, ji bo aliyakariya hiqûqî serî li ÎHD'a Îzmîrê da. Kiziltepe, destnîşan kir ku bi riya ÎHD'ê der barê polîsê ku gefan lê xwariye de gilî kiriye.

# Dijminantiya salan bi dawî bû

**WAN** - Di sala 1973'yan de di navbera gundên Xaçka û Soryan de li ser pirsgirêka zozanekî şer derketibû û 5 kes jiyana xwe ji dest dabûn. Dijminantiya 37 sal in didome li ser hewldanên BDP'ê bi aştiyê bi dawî bû.



Dijminantiya 37 sal in didome bi hewldana BDP'ê bi aştiyê bi dawî bû. Bi hewldana BDP'a Geverê li Gundê Xaçkayê xwarina aştiyê hate dayîn. Şêniyên her du gundan, Hesabgirê Giştî yê BDP'ê Salîh Yildiz, Parlamenterê BDP'ê yê Colemêrgê Hamît Geylanî, Şaredarê Elbakê Îhsan Guler, gelek rêveberên BDP'ê, saziyên din û nûnerên rêxistinên sivîl ên civakî jî di nav de nêzî 3 hezar kes beşdar bûn.

**Ji BDP'ê re spasî kirin**

Piştî BDP'î hatin pêşwazîkirin 3 hezar kesan destên hev girtin û li hev hatin. Pişt re rûspiyên her du gundan axivîn û peyamên aştiyê dan. Ji rûspiyê gundê Soryan Mustafa Bakî, keyfxweşiya xwe ya bi dawîbûna xwîndariya 37 sal in didome anî ziman û spasî ji hemû kesan kir. Piştre ji gundê Xaçkayê Şemsettîn Saydan jî diyar kir ku ew keyfxweş in ku xwîndariya bê wate bi dawî bû û wiha got: "Em bi salan in ji ber hinek axê bi gundê Soryan re xwîndar in. Xwîndariya di navbera me de me xilas nedikir. Lê piştî BDP ket navberê ev xwîndarî bi dawî bû."

Piştre Rêveberê BDP'a Geverê Şahabettîn Tamur jî axivî û spasiyên xwe ji her du gundan re kir. Serokê BDP'a Colemêrgê Orhan Koparan, Şaredarê Elbakê Îhsan Guler, Parlamenterê BDP'ê Hamît Geylanî û Hesabgirê Giştî yê BDP'ê Salîh Yildiz jî dema xwarina aştiyê de axivîn û li ser girîngiya aştî û tifaqa kurdan peyam dan.

# Li Amedê greva birçîbûnê didome

**AMED** - Malbatên girtiyên nexweş û endamên Diyar TUHAD-DER'ê ku bi boneya balê bikişînin ser rewşa girtiyên nexweş û binpêkirina mafan ên li girtîgehan, duh li Parka Koşuyolu dest bi greva birçîbûnê ya 6 rojan kirin, şeva xwe di konê de derbas kirin.

Greva birçîbûnê ya ji aliyê Diyar TUHAD-DER'ê ve bi armanca balkişandina ser rewşa girtiyên nexweş û binpêkirina mafên di girtîgehan de li Parka Koşuyoluyê duh hate destpêkirin ket roja 2'yemîn. Xizmên girtiyan û 50 kesên tevli grevê bûne şeva xwe di konê de derbas kirin.

Welatiyên hatine serdana çalakgeran jî piştgirî da wan. Di konde dowîzên wekî "Nurettîn Soysal ji mirinê re roj dihijmêre" hatin daliqandin. Malbatan, bi vê hewldana xwe dixwazin bala raya giştî bikêşin ser xwe û bang li rêxistinên civakî yên sivîl kirin ku piştgiriyê bidin çalakiya wan.



# 32 bijîşk binçav kirin

**AMED** - Li ser fermana Serdozgerê Komarê ya Êlihê li bajarên Êlih, Enqere, Amed û Wanê bi îdiaya "nelirêtiya dermanan kirine" operasyon hate destpêkirin. Di çarçoveya operasyonê de di serdegirtina hemdem a 4 bajaran de 32 bijîşk hatin binçavkirin.

Serdozgeriya Komarê ya Êlihê di çarçoveya lêpirsîna "nelirêtiya dermanan" a di sala 2008'an de dabû destpêkirin, li 4 bajaran operasyon da destpêkirin. Di operasyonên hemdem a "operasyona tenduristiyê" de li Êlih, Enqere, Amed û Wanê 32 kes hatin binçavkirin. Li nexweşxaneyên dewletê bijîşkên pratisyen û pispor 32 kes hatin binçavkirin. Li Êlihê 16 karmendên tenduristiyê piştî hatin binçavkirin bo kontrola tenduristiyê birin Nexweşxaneyê ya Êlihê, 16 kesên li Amed, Enqere û Wanê jî hatin binçavkirin dê bi riya talîmatê îfadeya wan bên girtin. Dozgerê Komarê yê Êlihê Mustafa Peker diyar kir ku wan di çarçoveya lêpirsîna "nelirêtiya dermanan" a sala 2008-2009'an de operasyon daye destpêkirin û dê operasyona wan bidome.

## KURTE NÛÇE

### Li Geverê sewqiyat

COLEMÊRG

Li herêma Oramarê ya navçeya Geverê tevgêr û sewqiyata leşkerî hate destpêkirin. Nêzî 50 wesayîtên leşkerî ber bi herêma Oramarê ve hatin sewqkirin. Li Şemzînanê jî sewqiyata konteyniran hate kirin. Nêzî 50 wasayîtên leşkerî, şevê din ji 21'emîn Fermandariya Tûgaya Cendermeyan a Sînor ber bi herêma Oramarê ve hatin sewqkirin. Hate zanîn ku leşker li Qereqola Kamişli hatin bi cih kirin. Li aliyê din 9 konteynir sewqî navçeya Şemzinanê hatin kirin.

### Hanefî Avci hate binçavkirin

ENQERE

Midûrê Giştî yê Polîsan ê berê Hanîfî Avci hate binçavkirin û birin ew Stenbolê. Midûrê Polîsan ê berê Hanîfî Avci ku bi pirtûka xwe ya "Haliçte Yaşayan Sîmonlar" ket rojeva Tirkiyeyê hate binçavkirin. Polîsan li mala Avci ya Eskîşehîrê lêgerîn pêk anîn û piştre binçavkirin û ji Enqereyê birin Stenbolê.

### Seferên Hewlêr û Rihayê dest pê dikin

RIHA

Piştî xebatek dûr û dirêj sefera balafiran a Riha-Hewlêrê dest pê dike. Hat ragihandin ku dê heftê 3 rojan sefer bêne kirin û pereyê bilêtê 49 TL yê tirk e. Riya balafiran a Hewlêr, Şam, Heleb û Qibrisê jî vebû. Li seferên balafirên Rihayê, di destêpêkê de Stenbol, paytextên Ewropeyê û Hewlêr hatin zêdekirin. Seferên hundir û ji derve yên Riha-Hewlêrê rojên sêşem, çarşem û yekşemê dest pê kir. Dê firîna yekem a ji Riha bo Hewlêrê 4'ê cotmehê pêk bê. Her wiha dê êdî Bora Jet ber bi paytexta Sûriye Şam, Heleb û Qibrisê ve jî bifirin.

### Li Şirnexê 2 kesên din hatin girtin

ŞIRNEX

Li Şirnexê piştî çend roj berê di serdegirtina malan de 5 kes hatin girtin, 2 kesên din jî hatin girtin. 2 kesên 2 roj berê ji aliyê leşkerên 23'yemîn Fermandariya Tumenê ya Sînor ve hatibûn binçavkirin sewqî dozgeriya komarê hatin kirin. Sedîk Batmaz û Mûsa Kutler, piştî li dozgeriyê îfade da, dozgeriyê bi daxwaza girtinê şandin dadgehê. Heyeta dadgehê jî bi îdiaya "alîkarî bi PKK'ê re kiriye" biryara girtinê da û şandin girtîgehê. Rojên borî dîsa Suleyman Uysal, Abdulmecît Otun, Zekî Azgan, Mahmut Sevîk û Hasan Sunar jî bi heman sûcdariyê hatibûn girtin

### Îranê qaçaxgerekî kurd qetil kir

MERÎWAN

Li herêma sersînor a Asîneva ya girêdayî bajarê Merîwana rojhilatê Kurdistanê, roja 26'ê Îlonê pasdarên rejîma îslamî qaçaxgerê bi navê Bextîyar Hewramî dane ber guleyan. Hat zanîn ku, Bextîyar Hewramî bê sedem rastî êrîşe hatiye û hatiye kuştin. Herî dawî leşkerên Îranê li bajarê Merîwanê, piştî şopandina du wesayîtên qaçaxgeran û piştre li gundê Miyane a Kelaterzanê gule li gundiyan reşandine. Di encama gulebaranê de du kes birîndar bûn.Tenê ji destpêka meha tebaxê ve herî kêm 6 qaçaxgerên kurd ji aliyê leşkerên Îranê ve hatin kuştin. Li gorî qeydên ANF'ê ji serê salê ve herî kêm 42 qaçaxçî hatin qetilkirin. Tê payîn ku jimara wan a rast gelek ji vê zêdetir be. Di navbera mehên tîrmeh û kanûnê de herî kê 53 qaçaxger li ser sînorê Îranê ji aliyê leşkerên Îran û tirk ve hatin kuştin.

www.arsivakurdi.org

# Bi boykot û Peyanisê hişê wan hate serî

Helwesta gelê Colemêrgê ji bo biryara boykotê derxistiye pêş, av bi ber dilê cerdevanan de jî berda û kesên ku 21 sal in cerdevaniya dewletê dikin jî çeka xiyanetê ji xwe kir û dest ji cerdevaniyê berdan



**COLEMÊRG** - Li gundên Geverê piştî boykot û teqîna li gundê Peyanisê 14 cerdevanên çekên xwe danîn. Aydin Er ê ku piştî 21 salan çeka cerdevaniyê danî got: "Ji bo teqawîtbûna min biçek mabû. Encax, ji ber encamên boykotê û teqîna li gundê Peyanisê ji bo em çekan berdin li ser me tesîr kir. Em ê ji vir û şûnde li cem gelê xwe bin û bibin parçeyek têkoşîna gelê xwe."

Piştî ku BDP'ê di referandûmê de serkeftinek baş bi dest xist û di encama têqîna li gundê Peyanisê de 9 kesan jiyana xwe ji des dan 14 cerdevanan çekên xwe danîn. Li gorî agahiyên hatine bidestxistin, cerdevanên li mezraya Mirgan ya gundê Pişkesîr, Fahri, Hîkmet, Emîn, Seracettîn, Nevzat, Emîrhan, Alî Oymen û Tahîr Yalçin, Murat Yalçin çekên xwe radestî Qereqola Sînevayê kirin. Li bajaroka Xirvatayê jî cerdevanên bi navê Halît Çîçek, Halît Tatli, Halît Taşel, Aydin Er û Berzan Sagkol jî çekên xwe radestî Fermandariya Cendirmeya ya navçeyê ya Geverê kir.

Cerdevanê bi navê Fahrî Oymen ku çeka xwe teslîmî Qereqola Sînava kir û anî ziman ku ji roja çek girtiye heta îro çeka xwe bin ax kiriye. Oymen, da zanîn ku piştî referandûmê bi hinceta 'li çekê nenêrîne û baş paqij nekirine' lêpirsîn li wan hatiye vekirin û wiha axivî: "Edî em çekan li hemberî gelê xwe hilnagirin. Em dê din baskê BDP'ê de bi gelê xwe re têkoşînê bimeşînin.

Welatiyê bi navê Aydin Er ku ji bajaroka Xirvatayê ye da zanîn ku di sala 1989'an e çekê cerdevaniyê hilgirtine û wiha got: "Hindik mabû ez malnişîn bibim. Lê piştî bûyera Peyanisê êdî wijdanê me qebûl nekir. Hemû gelê me li hemberî înkar û îmhayê bûne yek. Lê em tenê cerdevan li dervê vê yekê mane. Divê hemû cerdevan dest ji van çekan berdin. "

Serokê BDP'a Geverê Husnu Bulgan jî da zanîn ku her tim cerdevan wekî mertalan tên bikar anîn û xwest hekû cerdevan bi gelê xwe re bibin yek.

## Dadgehê 2 dozên Dîcle kirin yek

**AMED** - 2 dosyayên dozên Hevserokê Kongreya Civaka Demoratîk (KCD) yê berê Hatîp Dîcle yên bi îdiaya "Endamê rêxistinê ye" û "Doza KCK'ê' di dosya KCK'ê de bûn yek.

Hevserokê KCD'ê yê berê Hatip Dîcle, ji ber 3 axaftinên xwe yên cuda li 6'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê bi îdiaya "Endamê rêxistinê ye" dihat darizandin. Li ser daxwaza parêzerên Dîcle, doza "Endamê rêxistinê" bi dosyaya "Doza KCK'ê" re kirin yek. Parêzeran diyar kiribû ku naveroka herdu dosyayan heman mijar e û ji ber vê yekê dê darizandin dubare bibe û ji ber vê yekê bi daxwaza dosya bibin yek serî li dadgehê dabûn. Li ser daxwaza parêzeran 6'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê dosya kirin yek û bi dosyaya "Doza KCK'ê" re kirin yek.

## Ji bo Heskîfê kampa piştgiriyê li dar dixin

Erdogan ALTAN / ÊLIH – DÎHA

Amadekariyên Kampa Piştgiriya ji bo Heskîfê ya bi dirûşma "Bila Heskîf Tune Nebe" ku di navbera 11-17'ê cotmehê de li Heskîfê bê danîn, bi lez didom in. Koordînatora Kampê Dr. Akgun Îlhan, diyar kir ku armanca kampê nêzikatiya rayedarên dewletê ya li hemberî parastina kampê rexne bikin û li Heskîfê xwedî derkevin.

Bi armanca parastin û lêxwedîderketina warê dîrokî û çandî Heskîfê dê di 11-17'ê cotmehê de bi dirûşma "Bila Heskîf Tune Nebe" Kampa Piştgiriya Heskîfê bê avakirin. Di kampê de, çalakiyên wekî panel, hevpeyvîn, bêîtîatiya sivîl, muzîk, pêşbirk, atolye, şano û folklor dê bên lidarxistin. Li bendê ye ku hunermend, akademisyen, nivîskar, rojnamevan û dildarên xwezayî yên neteweyî û navneteweyî jî beşdarî kampê bibin.

Koordînatora Kampê Dr. Akgun Îlhan, diyar kir ku armanca wan parastin û jiyankirina Heskîfê ye. Îlhan, bibîrxist ku ji bo çêkirina bendava Ilisuyê hikûmet hemû hêza xwe bikar tîne. Îlhan, da zanîn ku ji ber çalakiyên sala 2001'an û 2009'an hewldana hikûmetê vala derket û wiha got: "Em hêvî dikin ku bi vê kampa û piştgiriya kes û saziyên neteweyî û navneteweyî bigihije hêzek kolektîf."




### Platforma muzakereya civakî

Îlhan, anî ziman ku divê êdî feraseta rêveberiya ku li ser tunekirina çandî û dîrokî bi dawî bibe û ji bo vê yekê jî têkoşînek kolektîf bê meşandin û wiha axivî: "Armanca kampê li hember feraseta rêveberiyên ku li şûna pêş bixe paş dixe, li şûna ava bixe xera dike û hilberîne wêran dike meşandina têkoşînek hevbeş e. Em dixwazin li ser vî esasî jî platformeke muzakereya civakî ava bikin. Tunekirina Heskîfê her kesan eleqeder dike û divê her kes li hemberî parastina wê hişyar bin."

Îlhan, daxuyand ku ew vê kampê li hemberî feraseta di avakirina projeya bendava Ilisuyê de israr dikin ava dikin û dê hewl bidin ku li hemberî vê ferasetê hêzekê ava bikin. Îlhan, derbirî ku hikûmet ji bo vê projeyê ji banqeyên Garantî, Akbank û şîrketa înşeatê ya Nurol-Cengîz piştgiriyê distîne û wiha axivî: Em wan hişyar dikin û dixwazin piştgiriyê nedin fesaseta talanker. Em dê ji bo muzakereya civakî ya parastina Heskîfê têkevin nava hewldanan. Li gorî çavkaniyên fermî ya dewletê 55 hezar, li gor çavkaniyên wan jî 100 hezar zindiyên Newala Dîcleyê, cihên mirovan û cihên kevnarî hemû tûne dibe. Parastina van nirxan dikev ser milê her kesî."

### 'Kamp ji bo hişyariyê ye'

Berdevka Hewldana Jiyankirina Heskîfê û Koordînatora Kampê Îpek Taşli jî, derbarê bernam û beşdarvanên kampê de agahî da. Taşli, destnîşan kir ku ev ji bo şahiyê vê kampê pêk nînin, lijberî vê yekê ji bo hişyarî û parastina Heskîfê kampê ava dikin. Taşli, anî ziman ku dê her kesî di vê kampê de bînin cem hev û yekîtiyekê ava bikin. Taşli der barê bernameyê de jî wiha axivî: "Em dê di vê kampê de panel, hevpeyvîn, çalakiyên bêîtaatiya sivîl, muzîk, pêşbirk, atolye, şano û folklor pêk bînin. Paraztina Heskîfê peywira herkesî ye. Ji ber ku her kesan eleqeder dike me bi kurdî, tirkî, îngilîzî, almanî, fransî, îspanyolî, îtalî û zimanên baskî li ser înternetê ji hemû welatan re banga beşdariyê şand. Ji niha de gelek kesên ji welatên derve dixwazin beşdar bibin serî li me didin.

## Ji DYG'ê şahiya kampanyaya zimanê zikmakî

**ÎZMÎR** - Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (DYG), bi boneya piştgiriyê bidin kampanyaya TZPKurdî ya perwerdehiya zimanê zikmakî şahiyek pêk anî.

Ciwanên Welatparêz û Demokratîk (DYG), bi boneya piştgiriyê bidin kampanyaya "boykotkirina dibistanan" a TZPKurdî û kampanyaya perwerdehiya zimanê zikmakî, li Cihê Pazarê ya navçeya Bucayê şahiyek pêk anî. Di şahiyê de li ser navê DYG'ê Murat Yilmaz, diyar kir ku daxwaza perwerdehiya zimanekê zikmakî mafekî xwezayî û demokratîk e.

### Daxwazên kurdan bînin cih

Yilmaz, anî ziman ku boykotkirina dibistanan çalakiyek mafdar û demokratîk e û xwest her kes li mafê xwe dê demokratîk derkevin. Yilmaz, bang li dewletê jî kir û xwest dewlet daxwazên kurdan bibersivîne. Şahî bi skeç, şano, lîstik û muzîkê bi dawî bû.

## PJAK'ê pevçûnên ser sînor red kirin

**HEWLER / ANF** - Berdevkê Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) Şêrzad Kemanger daxwiyaniyên rayedarên Îranê derew derxist û red kir. Kemanger got: "tu çekdarek me li ser sinor nehatine kuştin."

Der barê mijarê de Şêrzad Kemanger ji malpera 'Aknews'ê re wiha axivî: "Em, nûçeya der barê desthebûna di teqîna xwekujî ya Mahabadê de ku hejmarek kuştî û birîndar çêbûn red dikin û me ta di destpêkê de ew teqîn şermezar kir".

Kemanger wiha pê de çû, "Di dema derbasbûyî de tu çekdareke PJAK'ê li ser sinorê Îran û Herêma Kurdistanê nehatine kuştin û tu şer di navbera me û Artêşa Îranê de rû nedaye ku bibe sedema kuştina şervanên me, tenê topbaran hebûye ku tu zirarek giyanî li pey çê nebû."

Kemanger ew nûçe bi dûr zanî ku encamderên teqîna Mehabadê li ser xalên sinorî hatibne kuştin û wiha daxuyand, "Tu bingeheke wan nûçeyan nîne û tenê bo veşartina tawanbariyên vê kiryarê ye".

Wekî tê zanîn Berdevkê Wezareta Pêşmerge yê Hikûmeta Herêma Kurdistanê Cebar Yawer, nûçeyên der barê kuştina çekdaran li ser sînorên Herêma Kurdistanê red kiribû û diyarkiribû pêk hatibe jî şerekê, di nav sînorê Îranê de pêk hatiye.

Fermandarê Hêzên Bejayî yên Artêşa Îranê Mihemed Pakpûr duh ragihand ku encamderên sereke yên teqîna Mehabadê li deverên sînorî hatine kuştin.

Hêjayî gotinê ye ku roja 22'ê vê mehê li bajarê Mehabadê teqînek xurt di dema rêwresma leşkerî ya hêzên ewlehiyê de teqiya û di encamê de 12 kes mirin û 86 kes jî birîndar bûn. Piraniya qurbaniyan jin û zarokên kurd bûn.

### Ji Yawer daxuyanî

Berdevkê Wezareta Pêşmergehan ê Herêma Kurdistanê Cebar Yawer ragihand ku bi tu awayekî hêzên artêşa Îranê sînorê Herêma Kurdistanê nebezandine, binpênekirine û li ser sînor şerek rû nedaye. Yawer daxwiyaniyên rayedarên Îranî derew derxist û wiha pêde çû: "Der barê binpêkirina tixûbên herêmê de dema ku me daxuyaniya berpirsên Îranê bihîst; me pêwendî bi berpirsên navxweyî yên taybet ên parastina sînor danî û rêvebirê yekîneyên fermandariya sînor lîwa Rukîn Omer da zanîn ku bi tu awayekî hêzên Artêşa Îranê sînorê Herêma Kurdistanê nebezandine. Ew daxwiniya ji aliyê fermandarê hêzên pasdaran ve hat belavkirin, em gelek heyîrandin; ji ber ku tiştek wiha çênebû."

## CHP'ê jiwaniya bi MAT'ê re betal kir

**ENQERE** - Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê (MAT) di çarçoveya hevdîtinên ji bo çareseriya pirsgirêka kurd bi rêbazên demokratîk û aştiyane de xwest bi CHP'ê re jî rûne. CHP'ê ewilê jiwanî da û piştî çend saet ji bo hevdîtinê mayîn jiwanî hate betalkirin.

CHP'a ku îdia dike ji bo çareseriya pirsgirêka kurd helwesteke nû daye ber xwe, di pêşeroja xwe de israr dike. Meclisa Aştiyê ya Tirkiyeyê 3 rojan beriya niha di çarçova hevdîtinên ji bo çareseriya pirsirêka kurd bi rêbazên demokratîk û aştiyane jiwanî ji CHP'ê xwest. CHP'ê jiwaniya meclisê bi erênî bersivand û duh dê ev hevdîtin pêk bihata. Lê çend saetan beriya jiwaniya hevdîtinê Cîgirê Serokê Giştî yê CHP'ê Gursel Tekîn ku dê hevdîtin bi wî re pêk bihata, li endemên Meclisa Aştiyê geriya û got ku ji ber peywîrdariyeke navxweyî ew ê hevdîtinê bi endamên meclisê re pêk neyîne.

Ji Meclisa Aştiyê Îmam Canpolat der barê mijarê de agahî dan û wiha got: "Saet-du saet ji bo jiwaniyê mayîn Gursel Tekîn li me geriya û got ku ew ê bi wan re hevdîtinê pêk neyîne."

Canpolat diyar kir ku Tekîn peywirdariya navxweyî wekî hinceta pêknehatina jiwaniyê nîşan daye û derbirî ku wan helwesta CHP'ê fêm nekiriye.

www.rojevakurdi.org

# Ev jî provokasyona dadgehê ye: 10 meh ceza dan

**AMED** - Ji Hevserokê BDP'ê Selehattîn Demîrtaş re ji ber axaftina wî ya di Roj TV'ê ya sala 2007'an de bi hinceta "propagandaya rêxistinê kiriye" 10 meh ceza hate birîn. Parêzera Demîrtaş, Meral Daniş Beştaş biyarê wekî "cudakariya di hiqûqê de" nirxand û got biryar "Eyba hiqûqê ye"

Danişîna biryarê ya doza Hevserokê BDP'ê Selahattîn Demîrtaş, ku di 6'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê de bi hinceta "Propangandaya rêxistinê kiriye" hatibû vekirin, hate dîtin. Demîrtaş, tevli danişînê nebû, lê parêzera wî Meral Daniş Beştaş di danişînê de amade bû. Parêzer Beştaş, di danişînê de xwest dadgeh ji bo ku bersiva talîma îfadeyê ya ji 11'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê re hatiye şandin bê sekinin. Lê dadgehê balkişand ser xala zagonê ku dest dide parlamenter bên darizandin û diyar kir ku, beyî hatine bersivê dê doz bidome. Beştaş, di parastinê de xwest ku fîîla miwekîlê wê di çarçoveya azadiya ramanê de bê nirxandin û bereata Demîrtaş, xwest. Dozger, xwest ku dadgeh li gorî biryara xera kirinê ya Dadgeha Bilind tevbigere û Demîrtaş ceza bike. Piştî demekê dadgehê biryar da. Dadgehê, li gorî xala Zagona TMK'ê ya hejmar 7/2 biryara 10 meh cezakirina Demîrtaş da.

Beştaş, biryara dadgehê nirşand û der birî ku birayar wekî "cudakariya hiqûqê ye" û got ku biryar "Eyba hiqûqê ye"




# 'Bi çareseriyê bawer im'

## Hevseroka KCD'ê Tugluk tevî parêzerên Ocalan roja duşemê çû Îmraliyê û bi Ocalan re hevdîtinek pêk anî. Ocalan di hevdîtinê de peyamên xweşbîn ên ji bo pêvajoyê dan

**STENBOL** - Piştî du caran hate taloqkirin hevdîtina Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk a bi Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re roja duşemê pêk hat. Ocalan di hevdîtinê de baweriya xwe ya ji bo pêvajoyê anî ziman û got ku 'baweriya min a ji bo çareseriyeke aştiyane dê bidome.



Hevseroka KCD'ê Aysel Tugluk, bi Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan re li Girava Îmraliyê hevdîtin pêk anî û vegeriya. Tugluk diyar kir ku wan bi Ocalan re hevdîtinek gelek girîng pêk aniye û wiha got: "Me bi birêz Ocalan re hevdîtin pêk anî. Ocalan di hevdîtinê de got 'dê ji bo pirsgirêka kurd li Tirkiyeyê bi awayekî demokratîk û aştiyane çareser bibe ked û baweriya min bidome. Ji bo vê yekê jî divê hikûmet û dewlet ji bo çareseriyekî aştiyane û mayînde îradeya çareseriyê deyne holê. Tirkiye di pêvajoyekî girîng de derbas dibe divê ev yek neyên hebakirin. Di vê demê de di serî de hikûmet, CHP, partiyên siyasî, rêxistinên sivîl ên civakî, rewşenbîr û demokrat hemû kes berpirsiyar e.' Ocalan xwest hemû partî, saziyên sivîl û raydarên dewletê ji bo pêşeroja Tirkiyeyê di nava hewldanan de bin."

Hevdîtina ev 2 hefte ne li bendê li Îmraliyê pêk hat. Hevseroka KCD'ê roja duşemê serê sibê bi parêzerên Ocalan re çû Girava Îmraliyê û bi Ocalan re hevdîtin kir û vegeriya. Dema ku Tugluk çû Girava Îmraliyê û heta vegeriya rojnameger li bendê man. Tugluk piştî vegerê daxuyaniyek da û diyar kir ku wan saetekê bi Ocalan re hevdîtin pêk anîne û wiha got: "Me bi birêz Ocalan re hevdîtineke gelek girîng pêk anî. Ocalan got ku 'Ez ê ji bo pirsgirêka kurd li Tirkiyeyê bi awayekî demokratîk û aştiyane çareser bibe di nav hewldanan de bim.' Dixwaze ku hewldanên wî yên ji bo çareseriyê wekî textîk neyên fêmkirin û dibêje sekna min stratejîk e. Divê raya giştî jî vê yek wisa bizane. Di vê demê de di serî de hikûmet, CHP, partiyên siyasî, rêxistinên sivîl ên civakî, rewşenbîr û demokrat hemû kes berpirsiyar e."

Piştre rojnamegeran nêrînên Ocalan ên der barê agirbestê de pirsîn. Lê Tugluk bersiva pirsan neda û ji Gemlîkê veqetiya.

# 'Me 200 milyon TL dan Serbaz Karacan'

**WAN - DÎHA** - Malbata karsaz Kadîr Keremoglu yê ku di sala 1995'an li Wanê hate revandin heta niha tu encam ji lêpirsînê negirtin xwestin di doza Ergenekonê de bibin mudaxil. Malbata Keremoglu, bi daxwaznameyeyekê bi riya Dozgeriyê Komarê serî li Dadgeha Cezayên Giran a Taybet a Stenbolê da. Malbatê ji bo ku aqûbeta Kadîr Keremoglu bizanin 200 milyon TL pere dan.

Karsaz Kadîr Keremoglu di 5'ê nîsana 1995'an de dema ku li Wanê ji mizgeftê derdiket hate revandin. Vê bûyerê di raporên Susurlukê de jî cih girtin. Lê 15 sal in tu encam bi dest nexistin. Li gorî agahiyên wê demê ku di raporê de derbas bûn Kadîr Keremoglu 15 sal berê dema ku ji mizgefta li navenda Wanê derket bi wesayîta toros a plaqaya wê 01 EA 600, wesayîta Dogan a bi plaqeya 65 ER 279, wesayîta Broadway a bi plaqeya 06 SH 600 û wesayîta bi plaqeya 34 ALL 82'yan ve hate revandin. Piştî Keremoglu hate revandin li ber Lîseya Pîşeyî a Keçikan teslîmî Mahmut Yildirim (Yeşîl) kirin. Kurê Keremoglu Bahattîn Keremoglu, diyar kir ku piştî bavê wî hate revandin bi Midûrê Giştî yê Polîsan ê wê demê Mehmet Agar û Parlementerê Colemêrgê Mustafa Zeydan re hevdîtin kirin. Keremoglu, anî ziman ku Agar ji bo ku bûyerê lêkolîn bike bersûcê Susurlukê Wekîlê Serokê Daîreya Tevgera Taybet Îbrahîm Şahîn peywirdar kir.

### Li gel fidyeyê nehate dîtin

Keremoglu, bilêv kir ku li gel hemû hewildanan tu encam bi dest nexistin û bi riya karsaz Lokman Şahîn têkilî bi wan re hatin danîn. Keremoglu, da zanîn ku ji bo berdana bavê wî ji wî 750 hezar Mark hate xwestin û wiha got: "Me, pere amade kir. Lê ji bo vê yekê me xwest bizanibin ku bavê me sax e ya na. Ji bo vê yekê ji me xwast bavê me bi telefonê li me bigere. Lê ev daxwaza me pêk nehat." Keremoglu, da zanîn ku piştî pereyê wan xwest nedan 3 otobusên wan hatin şewitandin û piştre Serbazyê Îstixbaratê Nazîf Karacan bi wan re têkîlî danîn. Keremoglu, diyar kir ku Karacan ji wan re got ku "Hêj bavê we sax e. Ji bo serbest bê berdan hevî jî heye. 200 mîlyonan bidin em ê bavê we serbest berdin." Keremoglu, da zanîn ku 200 milyon TL xwestin li Şubeya Kavaklidere ya Banka Zîraatê razandin.

### 'Şehmus Durak agahdar e'

Keremoglu, bilêv kir ku ligel vê yekê tu agahî ji bavê xwe negirtin berpirsiyarên revandina bavê wî Fermandarê Leşkeran ê Wanê yê wê demê Yarbay Nevraz Ozalp, Waliyê Wanê yê wê demê Mahmut Yilbaş, Serbazyê Îstîxbaratê Nafîz Karacan, Mahmut Yildirim (Yeşîl), M. Cemal Kulaksizoglu yê ku berpirsiyarê bûyera Akin Bîrdal, Abdullah Çatli, xebatkarên herêma Wanê yên MÎT'ê û kesê bi navê Kerem ê pişnavî nezanin in. Keremoglu, da zanîn ku ji kesên berpirsiyarê revandina bavê wî yek jî Şehmus Durak e û Durak niha li Wanê digere. Keremoglu, daxuyand ku heke Şehmuz Durak bê lêpirsîn dê qatilên bavê wî derkevin holê.

### Daxwazname şandin Stenbolê

Di ser revandina Kadîr Keremoglu re 15 sal derbasbûn, lê tu aliyê hiqûqî zelal nebûn. Malbata Keremoglu ji bo ku di doza Ergenkonê de bibe mudahîl bi riya Dozgeriya Komarê ji Dadgeha Cezayên Giran a Stenbolê daxwazname şand.

Li aliyê din malbata Kermeoglu di zagona hejmara 5233'yan de serî li Komîsyona li Colemêrgê hate avakirin da û daxwaza madî û manevî kir. Lê 2'yemîn Komîsyona Tesbîta Ziraran dosya lêkolîn kir û bi hinceta "bûyera terorê nîn e" red kir. Bahattîn Keremoglu, bertek nîşanî biryarê da serî li Dadgeha Îdarê ya Herêma Wanê da. Keremoglu, anî ziman ku heke biryarekî erênî dernekeve dê serî li DMME'yê bide.



Adil Zozanî



adilzozani@gmail.com

# Heke jêwarê 3'yemîn jî nebe…

Hêj nav li vê pêvajoyê nehatiye kirin. Hûn bêjin; 'diyalog' ne diyalog e. Hûn bêjin 'muzakere' ji xwe qet ne muzakere ye. Ji ber hindê qonaxa berveçûyîna muzakereyan, mimkûn e ku bê gotin.

Di vê pêvajoyê de çi bê kirin dê pêvajoyê ber bi aştiyê ve bibe serî? Pirsa herî maqûl ev e. Dema di çarçoveya bersivên ku ji bo vê pirsê bêne dayîn de bifikirîn, tiştên ku neyên kirin jî zelal dibin.

Di rewşên wisa de gotin û kirinên berpirsiyaran pîvana esasî ye. Ji ber hindê jî ji her demê zêdetir livûtevgera berpirsiyaran li ber çav e.

Hêmaya esasî jî bawerî ye. Dema bawerî bê şikandin, ne çu xîm tên kolan û ne jî çu dîwar tên nijintin. Ew qas zelal e. Mînak ji salekê zêdetir e Hikûmeta AKP'ê bi navê 'berlêvekirina demokratîk' hewldanek daye destpêkirin. Lê ji ber ku gelê kurd bawerî pê neanî çu pêşveçûn çênebûn.

Çima?..

Lewre, kirasê tasfiyekirina siyaseta kurd li vê 'berlêvekirinê' hate kirin. Tabloya heyî, pêdivî ji gotinê re nahêle.

'Berlêvekirina' Tebaxa 2009'ê encama polîtîkaya siyaseta kurd bû. Hem ji Qendîlê Tevgera Azadiyê û hem jî ji Îmraliyê Rêzdar Ocalan li ser sêniya zêr fersendek danî ber Erdogan. Erdogan ewilê her wekî vê fersendê bibersivîne tevgeriya. Lê piştre tiştên din hatin kirin.

Niha pêvajoyeke nû hatiye destpêkirin. Dîsa siyaseta kurd fersendekeke nû daye ber Erdogan.

Beriya her tiştî divê baş bê zanîn ku ev fersend jî têk biçe, bingehê fersendeke din a ji bo çareseriyeke demokratîk û aştiyane namîne.

Lewre; di nava siyaseta kurd de 3 jêwar derbas bûn. Piraniya yên ku îro di nava siyaseta kurd de pêşberên xwe didin zorê jêwarê/neslê 80'yan e. Pirên di navbera jêwarê kurd ê 80'yan û dewletê de şikestîne. Noqteyên wan ên hevpar nîn in. Mînak ji bo ciwanekî kurd ê di nava şer de mezin bûyî Stenbol, Enqere, Îzmîr, Antalya ne xem e. Hevalbendiya wî û van bajaran nîn e.

Jêwarê kurd ê ku îro ji bo çareseriya pirsgirêka kurd destê xwe dirêjî dewletê kiriye, hê jî pirên xwe bi temamî ne ruxandine.

Divê Erdogan analîza vê yekê baş bike û ji bo vê pêvajoyê gavên ku dê bavêje baş bifikire. Dema baweriyê nede kurdan, tiştekî ku bikaribe bidestbixe nîn e.

Ewilê çapemeniya nê jî îktîdarê. Divê zimanê xwe sererast bike. Zimanê êrîşkar û zikêş divê neyê bikaranîn. Her wiha plangeriya ku tasfiyekirina siyaseta kurd bibîrtinîn divê neyê kirin.-Tabî heke niyeta wan ev nebe-.

Mesala li ser siyaseta kurd tê ferzkirin ku gerîla xwe ji bakurê Kurdistanê vekêşin. Di rojên ku rojnameyên nêzî hikûmetê vê mijarê derdixin manşetên xwe, Lijneya Wezîran biryara dirêjkirina tezkereya ji bo operasyonên dersînor dide.

Erê gelo; kurdekî van du daneyan dane ba hev dê çi encam derbixe?

Ez bêjim: Dê Koçgirî, Zîlan, Agirî… bîne bîra xwe û dê bêje dewleta tirk çav li Srî Lankayê ye.

'Armanca wan ew e ku gerîlayan li qadekê biçivînin û li hemberî wan operasyona qirkirinê bidin destpêkirin.'

Dera ev fikar lê heyî, mimkûn e ku bawerî lê bimîne?

Heta ku hêmayên vê fikarê berovajî dernekevin pêş, bi çavê kurdistaniyên dildarê azadiyê Hikûmeta AKP'ê dest ji plana tasfiyekirina siyaseta kurd bernedaye.

Ji taxê kurdan tabloyeke wisa heye… Erdogan an dê dest ji vê planê berde û baweriyê bide gelê kurd an jî dê hêviyên ji bo aştiyê dê têk biçin.

Vê carê têkçûna hêviyan, ligel xwe dê jêwarê 3'yemîn jî bibe…

www.arsivakurdi.org

# Zêbarî: Divê Amerîka aktîftir be

Li Iraqê ev bû 7 meh di ser hilbijartinê de derbas bû û hê jî hikûmet ava nebûye. Ev jî xesareke mizin dide rewşa siyasî ya Iraqê. Wezîrê Karên Derve yê Iraqê Zêbarî ji Amerîkayê xwest hê aktîftir tevbigere û pêşî li avakirina hikûmeteke nû ya Iraqê veke



**NEW YORK -** Wezîrê Karên Derve yê Iraqê Hoşyar Zêbarî ji Amerîkayê xwest ku ji bo avakirina hikûmeta nû ya Iraqê aktîftir be.

Li New Yorkê ajansa Associated Pressê bi Zêbarî re li ser rewşa Iraqê hevpeyvînek kir. Hat gotin ku ev 7 meh in ku li Iraqê hikûmet nehatiye avakirin. Ev jî bi awayê siyasî Iraqê bi nediyariyek re rû bi rû hiştiye. Her wiha ji aliyê aboriyê ve jî xesareke mizin dide Iraqê.

Hoşyar Zêbarî da zanîn ku piştî hêzên muharîp ên Amerîkayê di meha tebaxê de ji Iraqê vekişiyan kontrola ewlehiya Iraqê ket ser milê hêzên leşkerî yên Iraqê. Di vê demê de vahaliyeke ewlehiyê derneket holê. Bi vê awayî hat îspatkirin ku hêzên Iraqê karin ewlehiya xwe temîn bikin. Ancax nebûna hikûmetê bi xwe re problemên cidî derdixin holê.

Zêbarî destnîşan dike ku her kes xwe li dir digire û rewşê dişopîne. Der barê ewlehiyê de, îstîkrarê de û hwd. Rêveberiya Serokdewletê Amerîkayê Barack Obama jî di wê baweriyê de ne ku avakirina hikûmeta nû pirsgirêka iraqiyan e. Ji ber vê jî ji bo avakirina hikûmeta Iraqê risteke aktîf nagirin ser xwe.

**Mîsyona pêşvebirinê heye**

Wezîrê Karên Derve vedibêje ku ew di vê baweriyê de ye ku der barê Iraqê de mîsyoneke Amerîkayê ya pêşde birina pêvajoyê heye. Bi deregmayîna avakirina hikûmeta Iraqê rewşeke erênî jî derket holê. Dost û neyaran dît ku lîderên Iraqê guh nadin hêzên biyanî yên wekî Îran, Amerîka, welatên ereb, Tirkiye û hwd. Pêvajoya hat jiyîn jî li ber çavan raxist ku hêzên siyasî yên Iraqê li gorî xwe hereket dikin. Zêbarî vegot ku iraqî dixwazin ji bo siberoja xwe ew xwedî biryar bin, hikûmeta xwe ew ava bikin û dixwazin lîderên xwe ew hilbijêrin. Ancax pêkanîna vê daxwazê demeke dirêj girt. Ji ber vê jî dive Amerîka ji bo ev tengasî bê çareserkirin alîkariyê bide û hineke din aktîftir xwe tevli bike.

**Xetera Şerê navxweyî nema**

Zêbarî li ser rewşa giştî ya Iraqê jî wiha got: "Di nav 30 salên dawî de şer, ambargo, dagirkirin û ji ber rewşa parçe ya navxweyî bêzar bû. Ligel van xetereyan sînor neguhêrîn û şerên navxweyî neqewimîn û pêşî li vana hat girtin." Zêbarî vedibere ku dema herî xeternak ya Iraqê li paş hat hiştin. Ligel van êş û azaran, travmayên hatin jiyîn, hêviya wan a ji bo Iraqê winda nebûye, xurtir bûye.

**Iraq niha ewletir e**

Zêbarî bal dikişîne ser dema rejîma Serokdewletê berê yê Iraqê Sedam Huseyîn û wiha pêde diçe: " Dema Sedam de gelek amerîkî maxdur bûne û doza tazmînatê dikin. Ji bo vê 400 milyon dolar wekî pakêt benda pesendkirina parlamentoyê ye. Ev jî neqeba herî zor e, li ber parlamentoyê ye û divê parlamento biryar bide.

Wezîrê Iraqê Zêbarî vegot ku ew rewşa Iraqê zanin. Hêzên wek El Qaîde û Devleta Îslamî ya Iraqê dibe ku hin deman êriş zêde bikin. Encax ev ne wek berêye. Iraq li gorî berê hê pirtir bi ewleye.

**Prestîja Iraqê xurt dibe**

Li ser statuya Iraqê ya navneteweyî jî tîrendek erênî xêz kir û wiha mijarê vegot: " Li gorî demên borî prestîja Iraqê ya di nav cîhana ereb de xurtir e. Ji bo vê mênaka Misrê hat dayîn. Tê pêşkêşkirin ku Misrê li Iraqê sefaret vekir, Quweytê sefîr şand Iraqê, Mîrîtiyên Ereban, Bahreyn û Sûriyeyê têkiliyên xwe yên bi Iraqê re baş kirine.

## KURTE NÛÇE

### Îranê du partiyên muxalîf girtin

TEHRAN

Li Îranê du partiyên herî li pêş yên reformkar bi biryara dadgehê hatin girtin. Bi hinceta "xesarê didin ewlekariya neteweyî", doz li partiyên Eniya Tevilbûna Îslamî ya Îranê û Rêxistina Mucahîdên Şoreşa Îslamî hatibû vekirin. Her du partiyan jî di hilbijartina serokomarî ya borî de piştgirî dabûn berendamê muxalîf Mîr Huseyn Musawî. Piştî ku hat ragihandin ku serokomarê Îranê bi ser ketiye, welat tevlîhev bû û bûyerên protestoyî hatin destpêkirin. Di encama van xwepêşandanên protestoyî de gelek alîgir û endamên herdu aliyan hatin binçavkirin.

### Israîlê êrîş kir û 3 filistînî kuştin

QUDS

Balafirên Israîlê bi maşokan êrîşî herêmên navîn ên Şerîda Gazzeyê kirin. Di êrîşê de 3 filistînî hatin kuştin. Çavkaniyên filistîniyan dan diyarkirin ku êrîş bi şev li herêma rojhilat a wargeha penaberan a El Bureycê pêk hatiye. Di êrîşa ku bi balafiran maşok hatine avêtîn de, hat ragihandin ku 3 endamên Lîwaya Qudsê ya Rêxistina Cîhada Îslamî hatine kuştin. Berdevkiya artêşa Israîlê êrîş piştrast kir û da zanîn ku, êrîş bi hevkariya hêzên hewayî û serwîsa ewlekariya hindir Şîn Bet`ê pêkhatiye û êrîş li ser grubeke ku amadekariya çalakiyê dike.

## Li Mûsilê parêzgeheke serbixwe

**MÛSIL / ANF -** Danûstandinên navbera her du lîsteyên Biratiya Nînova û Hedbayê bê encam in. Her wiha tevlihevî jî berdewam in. Lîsteya Biratiya Nînova li bendê ye li sînorê parêzgeha Nînovayê, parêzgehek serbixwe çêbikin. Wan berê ev şiyarî dabû û ew dê niha vê yekê bi cîh bînin.

"Biryar divê ji aliyê Serokê Lîsteya Biratiya Nînovayê Xesrew Goran ve roja sêşema borî li bajarê Hewlêrê di civîneke çapemeniyê de ligel çend biryarên çareseriyê bihata dayîn, lê ji ber derketina tevilheviyekê di prosesa serjimêriya giştî ya Nînovayê de, ew civîn hat taloqkirin".

Der barê naveroka wê civîna çapemeniyê û biryarên li ser çareserî de jî ev bûn; "Ew biryar jî ragihandina parêzgeheke serbixwe ya li Nînovayê bû. Amadekariyên wê yekê berê hatine kirin ku eger danûstandin dîsan li rastî astengî û tevilheviyan were û berdewam bikin, Lîsteya Biratiya Nînovayê parêzgehek serbixwe îlan bike". Dibe ku roja sêşemê Lîsteya Biratiya Nînovayê civîna xwe ya çapemeniyê ku hefteya bûrî taloq kiribû, saz bike û tê de parêzgeha serbixwe rabighîne.

"Parêzgeh 17 yekîneyên îdarî digire nav xwe ku dikevin nava her sê qezayên Mexmûr, Şengal û Şêxanê. Tevî van sê qezayan, 14 nahiyeyên din jî ku akinciyên wan kurdin, digire nav xwe. Her çendî heta niha diyar nîn e ku kî dê bibe parêzger, lê belê texmîn ew in ku ew erk ji Xesrew Goran re bê dayîn û parêzgeh jî li ser hikûmeta Herêma Federal a Kurdistanê be". Der barê aliyên yasayî yên ragihandinê de dê parêzgehê bêje: "Em di civata parêzgeha Nînovayê de xwediyê 13 kursiyanin û nûnertiya wan deveran dikin ku dengê xwe dane me. Lewre di warê yasayî de jî mafê me heye ku parêzgeheke nû rabigihînin. Me berê jî ev şiyarî dabû û em ê vê yekê niha bicîh bînin".

## Generalê DYA'yê hat Enqereyê

**ENQERE / ANF -** Fermandarên Hezên Amerîkayê yên li Iraqê Orgeneral Lloyd Austîn, ji bo têkoşîna li dijî PKK`ê dê bi rayedarên tirk re bê cem hev. Li ser vê yekê duh bi balafirek taybet hat Enqereyê.

Orgeneral Austîn bi heyeta pêre li balafirgeha Esenboga ji aliyê erkdarên Nûnertiya Mezin a DYA'yê ya Enqereyê ve hatin pêşwazî kirin. Tê hêvîkirin ku, Austîn bi Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay û payebilindên leşkerî yên tirk re bê cem hev. Mijara sereke ya rojeva hevdîtinên Austîn wê PKK be.

Ziyareta Austîn a jibo Enqereyê, rastî demeke ku Tirkiyeyê di qada navneteweyî de ji bo tunekirina PKK`ê dîplomasiyek berfireh dayî destpêkirin tê. Musteşarê MÎT`ê Hakan Fîdan li DYA`ê dinava hevdîtinan deye, di navbera mekanîzmeya sêalî ya li dijî PKK`ê ya DYA, Tirkiye û Iraqê de li Bexdayê hevdîtin hatine pêkanîn û Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay jî li Seleheddînê bi Serokê Herêma Federe ya Kurdistanê re hevdîtin kiribû. Çavlirêye ku Atalay piştî bi Austîn re bê cem hev, di rojên pêşiya me de bi rayedarên Suriyeyê û Îranê re jî bicive.

## Pakistanê NATO protesto kir

**ÎSLAMABAD -** Hikûmeta Pakistanê ji ber ku NATO'yê di nav sînorê Pakistanê de bi helîkopteran êrîş pêk aniye şermezar kir.

Notaya protestoyê ya li ser mijarê ji ber du operasyonên cihê yên di nav sînorê Pakistanê hat dayîn. Di metna protestoyê de tê aşkerakirin ku desthilatdariya Pakistanê hatiye binpêkirin. Operasyona ku pêk hati ji dervayê destûra ku NY'ê dayî. Roja înê û şemiyê operasyon pêk hatibû. Hêzên NATO'yê diyar kiribûn ku di van êrişan de gelek mîlîtan kiştine.

Rayedarên NATO'ê destnîşan dikin ku ji erdê gule bera wan dane û wan jî li ser vê mafê şopandina kerm pêk anîne û demek kin ketine nav sînorê Pakistanê.

## Li Koreya Bakur desthilatdarî guherî

**SEUL -** Kîm Jong-îl desthilatdariya Koreya Bakur ji destê bavê xwe wergirt. Di medaya Koreya Bakur de hat diyarkirin ku lawê herî biçûk yê Serokdewletê Koreya Bakur Kîm Jong-îl rûtbeya generaliyê girt.

Bi vê peywirdarkirinê kesê ku dê siberojê de peywira serokdewletiyê jî bi dest bixe diyar bû. Biryara peywirê piştî kongreya sayasî ya Partiya Koreya Bakur a desthilatdar hat aşkerakirin. Kong-reya pêk hat kongreya herî mezin a 30 salên dawiyê ye. Pisporê Koreyê Prof. Victor Cha diyar dike ku Kîm Jong-un lawê herî biçûk yê Serokdewletê Koreya Bakur Kîm Jong-îl e û ligel ku qet leşkerî nekiriye rûtbeya leşkerî didinê. Li gorî Cha ev nîşaneya wesayetê ye. Ev rewş jî nîşan dide ku tenduristiya Kîm Jong-îl baş nîn e û dixwaze di demeke nêz de yekî ji bo cihê xwe amade bike.

Feleknas Uca

feleknasuca@web.de



## Hewldana jinên kurd

Riya giştî di rojên dawî de li ser mijara jinan radiweste.

Em jî di rojên dawiyê de di bin dirûşma Hewildana Jinên Kurd de carêkî din civiyan.

Wek tê zanîn jinên kurd di destpêka salê de konferansêkî jinên Kurdistanê li darxistibûn.

Yekemîn konferansa jinan bi tevlibûna jinên kurd ên ji her aliyê Kurdistanê hatibû lidarxistin.

Bajarê Amedê di rojên 24 û 25'ê nîsana 2010'an ji vê konferansê re malovaniyê kir.

Em di rojên dawiyê de 20 jin bi navê Hewltana Jinên Kurd çûn bajarê Duhok û Hewlerê.

Armanaca me xebata lobîyê ji bo duyemkonferansa jinên kurd bû.

Em dixwazin carêkî din bi tevlibûna jinên kurd ji hemû aliyên Kurdistanê bicivîn.

Bi ditîna hin xebatê me kûr bû û em bi firehî li ser pirsgirêkên jinên kurd rawestiyan.

Mijarên wekî:

Jin dikarin di pêvajoya aştiyê de çi rol bilizîn;

Divê jinên kurd saziyekî çawa bidamezirinîn ku xebatê jinên kurd her bi rêxistinî berdewam be, rawestiyan.

Di encama yekem konferansê de, avakirina koordinasonê ji bo jinên êzdî hatibû dayin.

Ev biryar ji aliyê jinan ve bi erenî hat pejirandin.

Me bi navê hewldanê ji bo aştiyê name ji bo Neteweyên Yekbûyî, Konseya Îslam a Dinyayê, ji bo Abdullah Gul û her wiha ji bo KCK'ê re rê kirin.

Ji bo agirbestêkî dualî me name ji bo aliyê kurd herwaha ji bo arteşa Tirkiyeyê re şandin.

Em naxwazin ku jinên kurd carêkî din bigrîn.

Em naxwazin ku zarokên kurd bikevin girtîngehan.

Bila kuştina mirovan bi dawî be.

Me li başûrê Kurdistanê bi kesayetiyên hikûmatê re jî civiyan. Û me daxwazên xwe bi nave jinên kurd pêşkêş kir.

Hemu kesayetiyan amadekirina duyemkonferansa Jinan pîroz kirin.

Yek ji berpirsiyaran bi ken ji me re got: "We wek jinên kurd yekitiya xwe çê kir û pêş ve diçin. We konferansêkî jî li darxist, lê me mêrên kurd hîn jî yekitiya xwe ava nekirî ye. Hûn pêşengiya me dikin û ji bo me dibin motor."

Mijarêkî girîng a hevditînên me jî Konferansa kurd bû.

Hemû deng ji bo amadekirina Konferansa Kurd e.

Atmosferêkî erenî ji bo Konferansa kurd di rojevê de ye.

Ger naye ji xwe bîrkirin ku hikûmeta Iraqê hîn jî nehatiye avakirinê.

Şansê herî baş ji bo Konferansekî xwe dide xûyakirin û di nav gel de tê xwestin ku di demek nêz de Konferans pêk bê û encameke baş bê bidestxistin.

Hemû kurd yekitî dixwazin.

Riya giştî ya dinyayê piştgiriya çareserîya pirsgirêka kurdan dike.

Heke rêxistinên kurd jî dixwazin yekîtiya kurdan pêşxînin, divê bi lez ji bo konferansekî têkilî dayînin.

Em dixwazin ji bin nîrê xelas bin, an jî dixwazin azad bin?

Divê hemû partiyên kurd vê pirsê ji xwe pirskin.

Divê aştî û azadî armanca wan a herî bilind be!

www.arsivakurdi.org

# Yekitiya kurdan dê bi pêşengiya jinê pêş bikeve

Gerîlayên jin ên PKK'ê, der barê amadekariyên konferansa duyem a jinên kurd de diyar kir ku fikr û ramanê jinên kurd çi dibe bila bibe, divê azadiya cinsiyetan esas bigire û li dijî vîna mêr têbikoşe



**Bêrîtan SARYA / BEHDÎNAN - ANF**

Gerîlayên jin ên PKK'ê amadekariyên 2'yemîn Konferansa Jinan a Neteweyî nirxand û diyar kir ku ji bo Kongreya Neteweyî ya Kurd konferansa 2'yem a jinan merheleyeke girîng e. Der barê amedekariyên konferansê de gerîlayên jin ên PKK'ê nêrînên xwe anîn ziman. Gerîlayên jin destnîşan kir ku fikr û ramanê jinên kurd çî dibe bila bibe, divê azadiya cinsiyetan esas bigire û li dijî vîna mêr tevli konferansê bibe.

Aliyek 2'yemîn Konferansa Jinan a Navneteweyî, aliyek Kongreya Neteweyî ya Kurd û pevajoyên din ji hêla gerîlayên jin ve tê şopandin. Jinan diyar kir ku ji bo bilinkirina têkoşîna azadiya jinê konferansa jinên neteweyî rolek girîng dilize.

**Parçeyên din ên Kurdistanê**

Gerîlaya bi navê Şîlan bi eslê xwe ji Kurdistana rojhilatê yê, got ku di nav gelê kurd û jinên kurd peşketineke mezin pêk tê. Şîlan, daxuyand ku her çar parçeyên Kurdistanê ji bo yekîtiyê amadeye û wiha axivî: "Her parçeyên Kurdistanê gel gelek hesas e. Têkoşîna azadiyê û polîtîkayên îmha û înkarê tenê li ser parçeyeke nîne û bandorê ser hemû parçeyan dike. Coş û heyecana xweseriya demokratîk a Bakur li hemû parçeyan bi bandor e. Îdamên li Rojhilat pêk tê bandorê li hemû parçeyên Kurdistanê dike. Divê KDP û YNK ji bo berjewendiyên xwe kurdan nekin qurban. Her wiha divê jin fikr û raman çend cudabin jî divê yekitiya xwe pêk bînin."

**Nasnameyeke azad**

Rumet Kubanî di sala 1993'yan de li başûrê rojhilatê tevli têkoşîna azadiyê bû. Kubanî, destnîşan kir ku jinên kurd bi îdeolojiya Ocalan nasnameyeke azad qezenç kir. Kubanî wiha dirêjî da axaftina xwe: "Îro hêza jinê gelek xurt e û baweriyê dide. Yekitiya neteweya kurd bi pêşengiya jinê dibe ku pêş bikeve. Jin li dijî pergala çelexwarî û tunekirinê çareseriyê digere û jiyaneke azad dixwaze. Konferansa jinê dibe bingeha konferansa neteweyî ya giştî. Bi salan in Tevgera Azadiyê bangî kongreya neteweyî dike, lê heya niha pêk nehat. Lê bi israrbûna jina kurd dê yekitiya kurdan pêş bikeve."

**Rewşa jinên Başûr**

Destîna Qendîl, ji başûrê Kurdistanê ye di sala 2002'yan de tevli têkoşînê bû. Qendîl, da zanîn wekî jineke başûrê tevlîbûna têkoşînê gelek girîng e û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Konferansa jinên kurd ji bo min gelek girîng e. Jinên li Başûr êdî li hemberî pergala serdestiya mêr dengê xwe bilind dikin û vîna xwe nîşan didin. Jin êdî dicîvin û çareseriya pirsgirêkên xwe nîqaşdikin. Her çar parçeyên Kurdistanê ji bo yekitiya kurd û aşitiyê dixebitin. Lê divê xebatên bidomin û bê xurtkirin. Divê li hemberî pirsgirêkên jinên başûrê Kurdistanê mijulayî zêde bibin û bersiv bidin hewcedariyên jinan. Li başûr gelek jin dawî li jiyana xwe tînin û an jî tên kuştin. Li dijî van mirinan divê xebateke taybet bê meşandin."

**Wateya welatparêziyê**

Nuda Batmana bakûrê Kurdistanê, got ku welatparêzî tenê li ser parçeyeke Kurdistanê pêk nayê û wiha got: "Ji bo welatparêzî hemû parçeyên Kurdistanê girîng e. Welatparêziyê tenê bi axê sînor nakin. Têkoşîna ji bo azadiya cinsiyeta demokratîk û komînal e. Konferansa jinan ji bo kongreya neteweyî ya giştî gelek girîng e. Jin pêşengiya wê tiştî dike. Fikra siyasî çi dibe bila bibe ji bo me tişta esasî têkoşîn e."

# Jinên BDP'ê amedekariya kongreya xwe dikin

**ENQERE / DÎHA** - Meclisa Jinan a BDP'ê, dê kongreya xwe di 31'ê cotmehê de bi slogana "Em dê bi hişmendiya siyaseteke komînal a jinan, xweseriya demokratîk ava bikin" li Amedê pêk bîne. Jinan ji bo kongreya xwe ya 1'emîn dest bi amedekariyan kir. Berdevka Meclisa Jinan a BDP'ê Şukran Dîkme, diyar kir ku dê kongreya xwe di pêvajoya li Tirkiyeyê pêşveçûnên girîng ên siyasî û civakî pêk tên, pêk bînin.

**Çareseriya pirsgirêkan**

Meclisa Jinan a BDP'ê, dest bi amadekariyên 1'emîn kongreya xwe ya di 31'ê cotmehê de li Amedê bi slogana "Em dê bi hişmendiya siyaseteke komînal a jinan, xweseriya demokratîk ava bikin" li dar bixin, kirin. Berdevka Meclisa Jinan a BDP'ê Şukran Dîkme, anî ziman ku ew wekî meclisa jinan yekemîn kongreya xwe di pêvajoyeke ku li Tirkiyeyê pêşveçûnên siyasî û yên civakê yên girîng de, li dar dixin. Dîkme, bi birxist ku çareseriye pirsgirêka kurd di pêvajoyeke girîng û dîrokî re derbas dibe. Dîkme, bilêv kir ku piştî hilbijartinên herêmî yên 29'ê adarê de AKP'ê bi operasyonên siyasî xwest li gorî xwe pirsgirêka kurd çareser bike. Dîkme, bal kişand ser pêşîlêvekirina APK'ê û derbirî ku AKP bi plansaziyê pêvajoya tasfiyekirin, înkar îmhayê tev geriya ye. Dîkme, daxuyand ku tevgera wan hemû hewldan vala derxistiye û wiha axivî: " Di noqteya ku em gihiştinê de AKP her çiqas piştî referandûma 12 îlonê behsa makezagonekî nû bike jî bi helwesta xwe ya li hemberî perwerdehiya ziman û daxwazên nasnemaya kurdan nîşan dide ku ew ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd ne samîmiye."



**Têkoşîna siyasî girîng e**

Dîkme, da zanîn ku AKP bi vê pakêta makeqanûnê xizmetê ji pêdiviyên demokratîkbûyînê Tirkiyeyê re nake û encama van polîtîkayan bêçareseriyê kur dike. Dîkme, da zanîn ku modela herî maqûl a çareseriya pirsgirêka kurd, modela Xweseriya Demokratîk e. Dîkme, xwest ji bo çareseriyê Ocalan wekî muxatab bê qebûlkirin û dest bi pêvajoya diyalogê bê kirin û wiha got: "Heke ev pêvajoya veguheze aştiyeke mayînde divê ev yek wekî şansekê bê nirxandin. Di vê pêvajoyê de têkoşîna siyasî cihekî girîng wergire. Rol û misyona jinê ya di vê têkoşînê de pêşengiye." Dîkme bi birxist ku ev ne tenê pêşengên qada siyasî ne yên qada civakî ne û wiha pê de çû: "Em wekî jinên kurd di qada siyasî de jî bo jinên Tirkiyeyî bûne modelek û mînakek. Kotaya jı sedî 40 a jinan û pergala hevserokê jî ji bo cihgirtina jinan a di nava siyasetê de girîng e."

**Li Amedê kongre bê lidarxistin**

Dîkme, da zanîn ku ew Kongeraya Meclisa Jinan a BDP'ê ya 31'ê cotmehê de li Salona Sporê ya Ziya Gokalp, di vê wateyê de girîng dibînin. Dîkme, da zanîn ku ew dê di nava vê mehê de bi meclisên jinan ên herêmî re civînan pêk bînin. Dîkme, derbirî ku bi girtina DTP'ê û derbas bûyîna BDP'ê wan di warê rêxistini de zehmetî kişandin û ji ber vê yekê ev kongre girîng e. Dîkme, diyar kir ku di 31'ê cotmehê de bi 10 hezar jinan kongreya xwe lidar bixin. Dîkme, bi birxist ku ew dê beriya kongreyê di 28-29'ê cotmehê de li Êlihê konferansekê li dar bixin û ev konferans ji bo amedakiraya kongreyê girîng e. Dîkme, da zanîn ku jin bi hişmendiya pêşengiyê dê aktiftir bin û ev kongre tê wateya peymana avakirina Xweseriya Demokratîk.

---

Mamoste Xemrevîn

mamoste_birane@hotmail.com

## Rojev li gorî kurdan diguhere…

Her çi qas pêvajo tev li hev be jî, rojeva Tirkiyeyê bi her awayî dagirtî be jî wekî her carî jinên kurd di 18-19' îlonê de careke din giraniya xwe ya di warê avakirina aştiyeke mayînde de diyar kirin. Yekemîn Konferansa Jinên Kurd a ku di nîsana 2010'an de li Amedê hatibû lidarxistin de biryara Komeke Hewldanê ya Jinên Kurd jî hatibû girtin. Vê komê hem ji bo kar û xebatên xwe yên pêşerojê hem jî ji bo ku rola xwe ya di warê aştiyê de baş bilîze li Dihokê civîna xwe ya yekemîn li dar xist. Bi xebateke birûmet xwe gihandin gelek partiyên siyasî û saziyên jinan. Jinên ji komê gava ku vegeriyan Tirkiyeyê xebatên xwe yên ku kirine jî bi raya giştî re par ve kirin.

Xebatên wan dê tenê bi vê parvekirinê nemîne. Ew ê hevdîtin û xebatên xwe yên şênber bi gelek sazî û kesayetan re bidomînin. Ji ber ku xebatên di warê aştiyê de piştî vê qonaxê êdî bî seknê nabin , divê kesên ku xwe dane ber vî karî bi israr bin. Di têkoşîna azadiya gelan de xala herî girîng jî ev e. Gava ku hûn dev ji têkoşîna xwe bedin, an jî têkoşînê hinekî sist bikin, serkeftin dê mimkûn nebe. Ji bo vê jî em dikarin têkoşîna gelê kurd a ku bi salan e bênavber didome bidin.

Wekî nimune beriya demekê kurdan bi helwesta xwe ya di referandûmê de; bi boykotkirinê diyar kirin ku li Tirkiyeyê hêzeke sêyemîn a xurt in. Piştî referandûmê êdî gelek der û doran qala Xweseriya Demokratîk kirin. Wekî din boykota dibistanan jî ev guftuguh kurtir kirin. Îro em dibînin ku zimanzan, civaknas, hiquknas, zanyar, siyasetmedar û hemû aliyên civakê derdikevin pêşberî qamerayan û nêrînên xwe yek bi yek tînin ziman. Ji aliyê din ve di qada şer de jî dema bêçalakîtiyê didome.

Di warê aştiyê de jî xeynî kurdan û jinên kurdan hewldanên gelek aliyan her ku diçe zêdetir dibin. Sazî û dezgehên sivîl û kesayetên serbixwe ji bo ku êdî kuştin û şer çênebin çalakiyên xwe didomînin. Dîsa îro her du partiyên siyasî yên di parlametoya Tirkiyeyê de AKP û CHP ji bo ku Makeqanûneke sivîl bê çêkirin li hev dikin. Ev lihevkirin ne di warê berjewendiyên hemû civakê de ne, bes di warê berjewendiyên aligirên xwe de dixwazin hin gavan biavêjin.

Lê kurdan çawa xwe di warê hêzeke sêyemîn de diyar kirin, dikarin di vî warî de jî giranî û hêza xwe diyar bikin. Kurd êdî îro di wê hêzê de ne ku hemû rojeva Tirkiyeyê bi sekna wan ve girêdayî ye. Tiştên ku kurd û tevgera azadiya kurdan û serokatiya kurdan dibêjin, li vî welatî ew dibin rojev. Ji bo vê jî divê kurd û derûdorên aştixwaz dev ji karên xwe bernedin û hêza xwe bigihînin hev û bibiryar bin.

---

# Jin dibin endamên serkirdayetî

**DIHOK** - Endama Komîteya Navendî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) Şîrîn Amêdî pêşbînî dike ku di Kongreya 13'emîn a PDK'ê de hinek surprîz derkevin û dibêje: "Ger 3-4 jin nebin endamên serkirdayetiyê, bêguman 2 jin dê her bibin endamên serkirdayetiyê."

PDK'ê biryar daye roja 11'ê kanûna 2010an 13'emîn kongreya xwe li dar bixe û niha di nav organên xwe de bi hilbijartina endamên kongreyê ve mijul e. Herwiha li gor sîstema kotayê, ji sedî 25'ê kursiyan bo jinan hatiye diyarkirin.

Şîrîn Amêdî niha yekemîn jin e wekî endama Komîteya Navendî ya PDK'ê ye, divê der barê de ji bo Rûdawê wiha axifî: "Di her du kongreyên PDK'ê yên borî de rêjeya endamên jin ji sedî 8 bûye û bo kongreya dahatû jî li gor sîstema kotayê divê ji sedî 25 ji endamên kongreyê jin bin, lê heta niha tu biryareke wiha nehatiye dayîn ka dê jin li gor sîstema kota biçin nava rêza serkirdayetiyê yan na."

Amêdî ku dixwaze careke din xwe ji bo serkirdayetiya PDKê berbijar bike, dijî sîstema kota ye û didomîne: "Rast e li gor rewşa berê ya Kurdistan û Îraqê pêwîst bû jin li ser bingeha sîstema kota werin diyarî kirin, lê nabe herdem jin li benda xêrkirinê bin." Şîrîn Amêdî, çend salan Seroka Yekitiya Jinên Kurdistanê bû, niha jî di kongra PDK'ê de çaverêya hinek surprîzan dike.



www.arsivakurdi.org

Serkeft Botan
serkeftbotan@hotmail.com



## Angaştên der barê me de

Bes ne dagirkerên kurdan gelek kesan di derheqa gelên kurdan de angaşt nivîsandine. Ji van angêştan em ê çend heban bi hev re par bikin. Walter Scheefus: di berhama xwe ya bi navê Çîroka Asyayê ya pênç hezar salan de wiha dibêje. Piştî babîla ê ku şaristanî avakirine. Arî ne. Ku ev jî nesebên îndogerman in. Ji bakura Almanyayê di ser Rûsyayê re li Turkmenistanê bicîh bûne. Ev qabîlên aryaniyan ku cotkar bûn şaristaniyên biber avakirine.

Henrî L. Kaster: di berhema xwe ya binavê Çîroka Biçûk a Rojhilat de bz. 2000'î de ji gelen îndoevropa bi ber başur de çûn. Ev civaka bêşên îranî Medî-Persî bûn. Persî li başûrê Îranê, Medî li bakura rojavayê Îranê li navserên çiyayên wê bi cîh bûn dibêje.

C.Bûrney. D.M.Lang: di berhema xwe ya bi navê Xelkê Çiyan de wiha dibêje. Bahsa îndoevropiyan dike ku bz. 3000 an ji başura Rusiyan û hetanî Ukranyayê ev gel lê dijiyan. Di heman berhemê de heman kes vê nişeya han jî ihmal nake. Di erheka van civaka de ne di warê filolojî yê û ne di warê arkeolojiyê de tu delîl û belgê nehatine dîtin.

Fîçher: di berhema xwe ya binavê Dîroka Cîhanê cildên 4'emin de ji bona Medan wiha dibêje. Ji başûrê rojavayê Evropayê li başurê Gola Hezarê û li navserên çiyayên wê bicîh bûne.

Li gora van zatên li jor kurd ji welatên evropayê qoçberî Zaxrosan bûne. Lê wekî ku DM Lang jî ku diyar kiriyê di derheqa ku kurd ji evrupayê qoçberî asyayê bûne hetanî niha tu belge nehatine bi dest xistin. Ev angaşt teva angaştên polîtîk in û ji hêla almaniyan ve hatine angêşkirin.

Mahmût Alusî: di berhema xwe ya binavê "Ruhulmanî" de wiha dibêje. Di eslên xwe de kurd ereb in. Hinik nivîskarên ereban jî wiha dibêjin. bz. 4000-3000 an ji bakurên Afrîqayê di ser Misir û Filistînê re li bakura çiyayên Sûriyeyê bi cîh bûne. xwediyên van angaşta belgeyên babilan û asuran wekî pelge rêdidin.

Bêşek ji dîrok nasên ereban ê Îslamî. Bavikên kurdan Rabîa-bînî nazar bînî Med ku kesekî erebe rêdidin.

Dibêjin bi hilweşîna avbenda Merabe re. Ji ber lehiya avê reviyane çiya û erebên ku zimanê xwe jibîr kirin e.

Hinek nivîskarê eraban dîsa wiha dibêjin kurd cinên ku xwedê perdan xwe ji ser wan rakirine. An cinnên ku bi qîzên hava re zewicîne kurd ji wan zayiyan e. Ji bona xatirê ku kurdan biçûk bixin çi ji destê kê hatiye kirin e.

Di berhema şerefnamê de Qirnê 16an de ku hatiye nivîsandin mîta dehak derdixe pêş berîme û kurdan bi wê mîtê ve girêdide.

Dîrok nasê islamî Mesûdî: di berhema xwe a bi navê "Murucel zehep" de afreneriya mîta kurdan bi mîta dehak ve girêdide.

Helbestvanê faris Firdewsî jî afrineriya mîta kurdan bi dehak ve girêdide.

Li gora Mehmet Emîn Fırat: di berhema bi navê dîroka Wartoyê de. Qewmek bi navê kurdan li ser rûhê cihanê tuneyê û nejiyaye

Angaşta tirkan a fermî ji xwe vê nêrînê diteyisê ne. Xert û xurt bû ne kurd. Di hevokek jorîn de me dest nîşan kiribû ku ji bona kuradan ji çandan heyvika bibereket (bereketlî hîlalê ) ku dur bixin û wan biçûk bixin çi ji destên wan hatine û çi xerabiyên cihanê nebaş hene layiqî kurdan dîti ne.

Ev agaştên ku di derheqa kurdan de hatine gotin û van angaşta bide hev û bavêje zibilgeha dîroka Kurdistanê kiteba şaristaniyê ya birêz Ocalan e.

# Ew qas hevdîtinên derveyî ji ber çi ne?*

PKK'ê ji bo piştgirî û hewldana alîgirê çareseriya demokratîk û siyasî, biryara agirbesta yekalî dirêj kir; lê daxuyaniyên rayedarên dewleta tirk ku gelê kurd bêzar dikin, hê didomin. Rayedarên dewletê bi derbirînên "Bi zimanê zikmakî perwerde nabe; ger bi zimanî kurdî perwerde bê dayîn, netewekî cûda û dewleteke cuda derdikeve holê." bîrûboçûnên xwe yên nijadperest aşkera kirin. Her wiha dibêjin, em ê bi tu awayî Xweseriya Demokratîk nekin mijara gêngêşiyan. Aşkera û diyar e, ev nêrîn û nêzîkatiyê han ne yê çareseriyê ye.

Digel zimanê neçareseriya, rayedarên dewleta tirk ji aliyekê din de jî Ewropa û Amerîkayê digerin, diçin Iraqê ligel rayedarên Başûrê Kurdistanê hevdîtinan pêk tînin. Wezîrê Karê Navxwe yê Tirkiyeyê dide zanîn ku dê di demeke nêzîk de serdana Îran û Sûriyeyê bike. Musteşarê MÎT'ê ku ji Amerîkayê vegeriya diyar dike ku dê biçe başûrê Kurdistanê. Baş e, ger pirsgirêka kurd pirsgirêka Tirkiyeyê ye; ev hevdîtinên derve ji bo çi ne?

Ger pirsgirêka kurd, pirsgirêka Tirkiyeyê be; encax li hundir bi diyalog, hevdîtin û gotûbêjan tê çareserkirin. Angaşta me ev e , ger Tirkiye dest ji qirkirina çandî û xwîmijîtiya ramyarî ber bide, ev pirsgirêk di nav mehekê de çareser dibe.

Li beramber gotinên wekî 'Pirsgirêka kurd, pirsgirêkeke dema dirêj e, di demeke kurt de nayê çareserkirin.' pêwîst e, em biguman û hişyar bin. Dewleta Tirk bi kevneşopiya xwe, şûna ku pirsgirêkê çareser bike; dixwaze hundirê meseleyê vala bike û çareneserkirina wê li zeman belav bike. Rast e; ji ber hinek karên teknîkî û kiryarî, pêwîstî bi zeman hey e; lê ne demeke wek ew dibêjin.

Dema di rabirdû de rewşa pirsgirêka kurd û radeya ku niha gihiştiye bîne ber çavan, ewqas dîplomasiya dewleta tirk, hem jî ya derekî, ne ji xêrê re ye. Ger di rojevê de çareserî hebe; Tirkiye ji ber çi ewqas dewletê dixe nav meselê?

Hê 10 roj berê, dema ku Parazvanê Mafê Mirovan Ahtîsaarî hat; ma rayedarên dewletê negotibûn "Em navbeynkar naxwazin; em pirsgirêka xwe, bi xwe çareser dikin." Di dema û atmosfera agirbest yekalî de bi taybetî jî di mijara pirsgirêka kurd de, ewqas hatin û çûyînan gumandar in.

Di têgeha 'teror'ê de pêdagirbûn; tê wateya xwasteka domandina nêzîkatiyên berê û kevn. Tirkiye hê jî heman ziman û têgehan bi kar tîne. Ev rewş û nêzîkatiya han girêdayî mantalîteyê (bîrûboçûnê) ye. Bo mafê perwerdeya zimanê zikmakî boykotkirina dibistanan bertekên ku hatibûn nîşandan; nêzîkatî û bîrboçûnên kevn dide ravekirin. Di eyan de diyar e ku ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd pêşniyareke ku a AKP'ê bi xwe be, tune.

Digel vêna jî hevdîtinên ligel BDP'ê erênî ne. Ligel vê pêwîst e, bi DTK'ê re -ku di nav gelê kurd de nûnertiyeke berfirehtir dike- jî hevdîtinan pêk bînin. Ji bo têgihiştina hûrgulî ya herdû aliyan, hevdîtin sûdbexş û pêwîst in.

Ji bo Cemîl Çiçek tê gotin ku dewleta kûr a di nav AKP'ê de. Dibe ku rast be; lê dema ku mebesta çareseriyê hebe; nêzîkatî û zimanê herî zû biguhere wê yê dewletê be. Ji ber vêna kesên ku dibêjin 'hevdîtina bi BDP'ê re erênî bû' jî qisawet û gumanên xwe tînin ziman.

Berê hertiştî divê Tirkiye di warê çareserkirina pirsgirêka kurd de ji hêzên derekî û ji welatên herêmê, dev ji alîkarî xwastinê ber bide. Aliyên pirsgirêkê, kurd û Enqere ye. Divê Enqere berê her aliyê, yekemcar aliyê kurd serwext bike. Her wiha hêza aliyê kurd heye ku di diyalog û gotûbêjan de pêşniyaryên çareseriyê pêşkeş bike.

Piştgiriya raya giştî ya cîhanê bêguman girîng e. Piştgiriyeke bi vî rengî dibe handêr û ew jî dibe bayeke bo çareseriyê. Divê tu alî û kes dijî peywendiyên bi vî rengî nebin. Berovajî têkiliyên bi vî awayî bo mayîndebûna çareseriyê, gaveke ber bi pêş e.

Gelê kurd, li dijî hevdîtinên dorpêçkirin, jinavbirin û tecrîtkirinê ne. Ger gotin 'Em ê van tiştan pêk bînin, em ê mecbûrê projeyên xwe yên ne çareserî ne, bikin' wê demê ev dibe hewşa bê derî û kolaneke kor.

Di çareneserkirinê de pêdagirbûn ev in: Qaşo "Wê PKK bê dorpêçkirin.", "wê ev çavkaniyên wan ew çavkaniyên wan bên birîn.", "Wê hinek kurd li dijî PKK'ê der bikevin û bi vî awayî dê bê biçûkkirin." Ev boçûnên han di çareneserkirinê de ji pêdagirbûnên kevn ne kêmtir in.


'Pispor' ewçend zêdebûne, her roj bi dehan pispor û stratejîst derdikevin ser televîzyonan. Taktîk û stratejî û nêzîkatiya yekî/ê naşibe yê/a din. Diyar e, kî zêdetir mirûzê xwe bike û awirên xwe tûj bike, dest û piyên xwe bihejîne; ew dibe stratejîstê herî baş. Şûna ku li Tirkiyeyê ji bo çareseriyê nêrînên zelaltir derbikevin û derbixin; her roj hiş û mejiyan zêdetir tevlihev, aloz û şêlû dikin. Di dawiya dawîn de ne çareserî, polîtîkaya ji navbirinê derdikeve holê.

Niha yên ku xwe herî jîr dihesîbînin, bi teoriyên balkêş û bi derxistina hêkên zêrîn, dibêjin bila PKK derkeve derveyî sînorê Tirkiyeyê bi vî awayî şer radiweste. Rastiya herî rasteqîne nayînin ziman; nabêjin, ger pirsgirêka kurd çareser bibe şer diqede. Ji bo çareseriya siyasî ya pirsgirêka kurd, Enqere û hevkarên wê şûna ku hinek rê û rêbazên maqûl hilbiberînin, çi dikin, çareneseriya ku sebebê wê ne xwe dide aliyekê û PKK dike navenda wê. Bi vî awayî dixwazin raya giştî bişehitîne û bixapîne.

Her kes baş dizane ku heya pirsgirêk çareser nebe, PKK dernakeve derve û naçin tu deran. Ma wê demê dê nepirsin, ji ber çi PKK'ê ev têkoşîna de destpêkirin? Ji ber vêna gotina "Gerîla derbike derve, şer radiweste." tu wateya wê tune.

Ger çareserî tê xwestin, divê cidîtir bin. Di çareseriya pirsgirêka kurd de divê gava yekem; dest jê berdana armanca qirkirina çandî-zimanî û desthilatdariya siyasî be. Pêwîst e Enqere ji bo dilûcaniya xwe bipeyîtîne vîneke ramyarî ya ciddî dest nîşan bike. Piştre dikare diyalog û gotûbêj dest pê bikin. Ger dewleta Tirk van gavan biavêje, çareseriya pirsgirêkê herî dereng di nav mehekê de pêk tê. Ji ber ku daxwazên Kurdan maqûl in, ji ber vêna tu derdorên demokrat û demokratek red nake, nikare red bikin.

Divê dewlet û hikumet guh bide dengê hestiyar û hişê asayî yê Îmraliyê. Ger pirsgirêka kurd bi diyalogên wê derê çareser nebe; bêguman wê şer û pevçûnên pir dijwar bikeve rojevê ango derbikeve.



Rayedarên dewleta tirk pirsgirêka kurd wekî pirsgirêka navxweyî binav dikin û lê ji bo pirsgirêkê bi Amerîka, Ewropa, Iraq, Îran û Sûriyeyê re hevdîtinan pêk tînin

** Ev nivîs ji Ajansa Nûçeyan a Firatê (ANF) hatiye girtin.*

www.arsivakurd.org

# Karkerîy çira qeza kenêy?

## Merdişanê ke di tersaneyan di benêy lazimo ke bêrê lêkolînkerdiş. Gora xala 2'in berpirsîyarî sûc kenêy. Qabê karkeranê tersane û înşaatîy nêmirê lazimo pîspor xebat bikerê

Gurekara Hîndekareya Zanîngeha Bîlgî ya Stenbolî û endanê LÎjneya Cikenayişanê Tersaneyanê Tûzlayî Dr. Asli odman, Gora Lijneya Ewleheya Civakî yanê LEC (SGK) 7 deqeyan di yew qezayê karî yeno meydan û her 10 saetan di yew karker cuyê xo vinî keno. Tirkîya di her her 10 deqeyan kesê cuyê xo vinî keEy

Goreya daneyanê LECa Tirkîyayî, her 7 deqeyan di yew qezaya karî beno. Û her 10 deqeyan di yew xebatkar cuyê xo vinî keno. Seyî ra 16.5 êy qezayanê karîy seat 1'in de benêy.

Seyî ra 46 saetanê sifteyinê 3 di benêy. Kesanê ke di bin banê LEC de yê qezayanê ke aşma sifteyine seyî ra 8'ê ci karê înşaatî di binêy. Her roj di ney karî di 200 kes qezayanê karî ravêrenê. Nînan ra 3 cira mirenê.10 karkerdî zî seqet manenê.

Cayê tersaneyan de rewş bi ferq nîyo. karkeranê tersaneyan goreya serran wina yo; 2005 di 8, 2006 di 10. 2007 di 12. 2008 di 21. 2009 di 15. 2010 di qabê 6 menganê peynîy di 4 kesîy bi cînayeta qurban şîyê. Fi karxaneyanê asin yê ke 6 hezar û 971 qezayî bîyê. Onlarî îzleyan qazalar sektora komî de yo no zî 5 hezar û 728 kesîy cuyê xo vinî kerdîy .



### Qezayî benêy rûtîn

Komîsyona lêkolîneya tersaneyanê Tuzlayî ra Dr. Asli Odman ard ziwan ke: "Tersaneyan di karkerî davistê nîmeyî ema qezayî kemî nêbîyê goreya qanûna: "Karanê ke teknîk wazenêy nêşenê barê kesanê binî bibêy." Esto. Odmanî ard ziwan ke tabloya merdiman tersîneno ra merdim weş ewno se: "Hilberîner zêd bi. Tîrmehî di 4 karkerî Zonguldag di tersaneyan di semedê ke îskele cayê şaş di amewo ronayişî ra kewtê war û merdêy. Tebaxî di, tersaneyanê Yalova di, merdişa kewtişê biloqan mîya bi. No dem bîyo terajî qomîij.

### Karê medarê taşaronan

"Qabê ke qezayanê karî kemî bikerê cidayiş lazimo. Besivê ney zî kar nêdayişê taşeronan ya zî denetlemeya înan o. Ziwanê ma di alû nêmend ke ma vat. Xala 2'in ya qanûnî vano karê esil nêdayeno taşeronan. Eme rayna zî danêy.Semedê tersaneyan di bi seyan karkeranê taşeronan esto ra qezayî zaf benêy. Almanya di karê viraştişê îskeleyî danê kesanê prefesyonelan virazenê. Bê ney karî çîyê nêkenê. No karê wina bi vate yo."

Odman ard ziwan ke lazimo heşê karkerdişî bivirazyo û vat: "Xala 2'in muhîm o. Kokê qezayî senî bîyo lazimo ke weş bêro lêkolînkerdiş. Yanê gere mevajê qedera mi o se ez o bimirî. Tirkîya di hewna sîstema ke bişêro kokê qezayî sero û wedarno çîno. Tim û tim di heman tewrî di merdişî benêy. Îsleyî ra kunê war û mirnê. Semedê nînan sero vindertiş ferz o. Eynî çî di înşaatna di zî zaf o. Di sektora înşaatî de zî lazimo lêkolînîy bêrê kerdi."

### Çareserey kokî de yo

Qabê ke qezayanê karî dafînê herî asta kemî ra, lazimo ke heme rayxistişî bikûrê dewre û vat: "Qezayanê karîy di eger karkerî çînê bê se şima nêşenê çareser bikerê. Tirkîya di antîdemokratîkey esto û karker têkoşîna eyra yeno dûrfînayeneç. Qabê qezayî kemî bibêy lazimo ke di qada polîtîkey di gamîy bêrê eştiş. Dewlet sendîkayan muhatap nêgeno. Lazimoke heqê karkeran bi sendîkayan bêro dayiş Tirkîya di no çî çîno. Hikûmat bi çimêna ewnîyeno karkeran."

Şarî mîyan di vînayişê esto o zî karkerî bê perwerdehey êy o. Odman ard ziwan ke ma qabê ewleheya xebatkaran lazimo ke heme kesîy karê xo bikerê û perwerdeheyî ra ravêrê.



# Bi kelepçe dermankerdiş û Sîncan

**ENQERE / DÎHA** - Cihan Karagol zîndana Sîncanî ya 1 humarin de yo. semedê problema didananê xo berdêy nêweşxaneyî. Doxtor cira vato: "Bi lelepçe dermankerdiş prensîbê min o."

Cîhan Karagol di nameya xo ya ke eşrawito DÎHA yî di ardo ziwan ke, qabê didananê xo ey berdê nêweşxaneyî. Doxtorî ci ra vato ez dermankerdişî bi kelepçeyan keni û doxtorî no çîyî ze pirensîbê ey o dawo mojanyiş. Û nameyî di vano: "Dermankerdişê winayine ma bi Ercan Akpinarî pîya qebûl nêkerd û ma eşrawitî hucreyanê xo û dermankerdişê ma ame astenkerdiş."

Çîyê ke amewo Karagolî eynî çî ardê sereyê Cengî Kahramanî zî. Ey zî dermankerdiş qebûl nêkerdo. Qabê ney zî daxwaznameyê dawo dozgerey ema cira hêvîya ke bersiva bi erenî bêro dayiş çîno. Goreya ke vano dê Dozger cira bivajo îcabê cipersişî çîno û dosyayî dê bigêy. 9.5 mengano ke mafên minê yê telefonî ez nêşkenî tenê biberê. Eger çîyê winayine nêbo hal bêran beno."

# Erxenî di dayik bîyiş, zor o

**AMED** - Hêrêma Kurdistanî di bi seyan kesîy ke temenê înan binê 18 serreyê de yê benê ma/dayik û gedayan anê. No çî qabê înan zaf zehmet o.

Qeza Amedî ya Erxenî di goreya daneyanê nêweşxaneya Dewleta ay, 9 aşmanê 2010 di 69 cenîyanê ke binê 18 serreyî de yê gedeyî ardêy.

No çî goreya zanistan feodalîteyî ra yeno. Di serranê qijkekin di jewicyayiş talûkeyê de gird o.

Goreya ûzmanê welidnayişî Dr. Alî Îrfan Guzelî, nêweşanê ke 9 aşman di ameyê nêweşxaneyî 2010 di humara înan resayê 69 kesan.

Hêzanê ewleheya nêweşxaneyî çîyê wina gerotê binê mercekî û no encam vejyawo.

### Hekîmê pawitox ferz o

Guzel ard ziwan û vat: "Jewaca serranê gedetey weşeya mayî di kişta neyîney di keno binê xetereyan.

Kişta bînî di berpirsîyareyê dê gird dano mayî ke, temenê ay nêresawo 18'î û bîya mayê. Ambazanê ay di rojavayî di kaykenêy ema herêma ma di nêy gedeyî gede anê û berpirsîyareyê de zaf gird genêy xo milan sero. Gedeyanê ke rew benê mayê, daha rew zî ber (duşuk) erzenê. No rîskê dê zaf gird o.



Bi ney hawayî weşeya pitikî zî kuno talûkeyî. Na gam qabê ke no çî herêmî di wedaryo zaf zor o.Di ney mijarî di, kar kuno milanê heme kesan û qabê ney kesîy rew mejewecyê û neyîneya nêy çîyan înan ra bêro vatiş. No zî waxt wazeno."

# Engemînê Kurdistanî bazar geyreno

NAVENDA NÛÇEYAN - AMED

Engemînê herêma Kurdisanî her ke şino bi vate beno. Çimkî zereyê ey di çîyê ke merdiman ra zirar bibo çîno. Engemînê herêm Mûşî rayîran sero roşîyeno. Qalîteya ey û buhayê ey raxbet vîneno. Problema herî gird bazarkerdiş o.

Kesanê ke meyisanê engemînî wey kenêy ardî ziwan ke engemînê înan heme xozayî yo.

Rayîran sero engemînê xo roşenê. Kesanê ke engemînê xo roşenê ra Mûsa Taş ardi ziwan ke, engemînê înan kam geno se rayna yeno genêy. Çimkî engemînê ma xozayî yo.

Goreya kesanê ûzmanê ney karîyê vanê herêmî di engemînê herî weş vejîyeno. Eger bazara ey bibo se dê daha zêd raxbet bivîno. Feydeyê engemîna herêmî wina yo.



✓ Engemîn di warê vîtamîn, mîneral, amînoasît û mijyayişan bi madeyan zaf dewlemend o.

✓ Engemîn esasê karbonhîdratan û çimeynîya ci yo. zereyê eydi nezdî seyî ra 17 aw, 82 karbonhîdrat û 1 zî proteînîy, amînoasîtîy û mîneralîy estêy.

✓ Di yew koçika şamî di 64 cal enerjî esto. Qabê pazûyan enerjîyê virazeno.

✓ Semedê ke zaf vilanêy vaşan ra amewo girotiş ra zaf nêweşîyan ra şîfayo.

✓ Engemîn antimikrobiyal û antifunga bandorê keno û goreya feydeya nînan dezengtefe kerdiş keno. Nêverdano ke bakterî û singirî bivejyê.

✓ Engemîn merdiman verê nêweşîyan di paweno.

✓ Qabê virazyayişê cayanê bi kemin û birînan zaf weş yeno.

✓ Engemîn qabê mîde û loqleyan/rovîyan weşkerdişî ra zaf weş yeno.

✓ Çermê merdiman daha weş dano eysayiş û merdiman verê ciwan mendişî beno.

Zaza Cebelî
zazacebeli@hotmail.com



# Rojev zaf bi hereket şino

Dagirkerdişê rojevî bi verên ra boykot o. Diyinê se qebûlkerdişê muhatabî yo. Têkoşîna kurdan ya dema çarine di, despêta otonomî ya demokratîkî ya. Neyê referandûma bi qabê bedilnayîşê kanûno bingeyê 12 êlule, şarê kurdan ra bi vesîleyê boykota otonoma demokratîkî. Bi neyê vesîley ra referandûmî ra şarê kurd bi îradeyê xo eşkera kerd.

Neyê beyankerdişê îradî zî, şarê kurd xo bi xo îdarekerdiş o. Verên ra hereman dê Kurdistanî de destpêkerdişê mintiqaya otonomî ya.

Şarê kurd ney referandûmî de bi serkewtiş ra vejîya. No serkewtişê şarê kurdan zî her kesîy kebûl kerd.

### Kombîyayîş muhîm o

Hînê her kesîy zî va ke, bê sermîyanê kurdan çareseri û pêameyiş nêbeno.

No qebûlkerdişê mûhatabî zî bi verê ra kanê muşteşarê MÎTî Cevat Oneşî ard ziwan.

Cevat Oneşî vake: "Vatişê Ocalanî zaf muhîm o û mantiqlî yo. Zafêreya nuştoxanê tirkan zî neyê vatişê Oneşî qebûl kenêy. Vanê qabê dawaya çareserîya kurdan rolê Ocalanî zaf muhîm o. Ney rojan de erkanê dewletî, BDP rey de kombiyayîş viraşt.

Ney roniştişê kombiyayîş di BDP û dewletî zî zaf memnûn variştîy. Enkay ra pey zî nê hewa kombiyayîşê ronişte dewam keno.

Zatî bi qabê pêameyîşî ra çareserî ra rewna erkanê dewletî Ocalanî rey de, bi nimite veynayiş bîyê. Çapemenî rojnemegari tirkan zî qabê pêameyiş û aştî ra xo heme hewra verodanê. Bi teybeti ra rojnemegar nuştox Hesen Cemal pîzera qabê çareserî ra pêameyîşî ra xo weş verodano xebitîyeno.

Ney rojan de çareserî û pêameyiş zaf nêzdî bi. KCK zî biryarê bi çalakî yew hewte derg kerd. La çi heyfo ke neyê nêzdîbîyayîşê çareserî û hêvîya pêameyîşî bîy se. Yew desto tarî ra û qilêrin ra serobin virazeno.

Tayîp efendî neyê nêzdibîyayîşê hêvîya pêameyişê û aştî ra, bixebîr bixebîr tewş tewş qalî keno.

### Boykot serkewt

Şarê kurd bi qabê ziwanê dayik ra girotişê biryarê TZP- KURDÎ ra 20 êlule ra heyana 25 êlule boykota dibistanê tirkan kerd. Gedeyê domanê xo nêerşavitî dibistanan. Va wa ziwanê dayikî wazaenê ziwanê perwerde bibêy û wa ziwan bibo fermî.

TZP- KURDÎ vake ma neyê çalakîya boykota ziwanî bandora dewletî ancena. Ek dewlet qabê ziwanê dayik ra cewab nêbo se ma çalakî ya xo heme hewra berdewam kenêy. Bi neyê çalakîya boykotî, panc rojî qedîyay. Boykota nêşîyayîşê dibistana hereman de Kurdistanî de zaf cayan de zî serkewtiş ra virazîyay.

Tayyîp zî no çen rojîyo raşte de nêaseno naseno. No rojan nêşka vera vejîya raşte, dolmabahçede çapemenîyan reyde beyanet viraşt. Ney beyanetî ra vake ma qetîyen yewna ziwano dîyinê qebûl nêkenê. Ek kurdî wazenê se, wa kursê ziwanê xo akê.

Tayip efendî neyê watişî ra henekanê xo keno şarê kurdan ra. Ek ziwanê şarê kurdan dibistanan de fermî nêbo se, çareserîya kurdan zî qet nêbena. Bi zihnîyetê AKP nêbedilîya yo. AKP ewta de kompleks virazena. Vanê ma ziwanê dayika kurdan bi fermî de qebûl nêkeno û ma muhatap zî qetîyen qebûl nêkenêy. Yew qala verêna esta vanê no çi lahaneyo û çi perhîzo. Şarê kurd hînê enkay ra pey zî qabê ziwanê dayika xo ra çalakîya boykota ziwanî berz kenê xort kenêy otonoma demokratîkî şên kenêy.

www.arsivakurdi.org

# Çûn! Kom bi kom qefle bi qefle çûn!



M.EMÎN SIRÇA

Dagirkerî, tacek ji sitirî bû li ser serê wan. Giyan ji bedenê hatibûn mêtin, mêjî hatibûn kotin.

Xeleka mirinê li dora welatê wan dorpêç bû; mîna welatê Hades tarî, bêdeng, cemidîbû Kurdistan. Her însanek bi hiş û ramanê xwe ve daleqandin, ji zilmê hiş winda bû. Di heyînê de'tunetî' hatibû avakirin bi zilmê, kuştin û îşkencê. Kuştin, nîşana neheqî û encama lewaziyê ye. Ji bo ên bindest jî wekî kesixadina mêwê ye, roj bi roj mezin dibe. Azadîxwazî û kujêrî mîna av û agir e. Agir çiqas dijwar be jî av wê bifetîsîne agir. Tu cara bi dagirkerî û kuştinê hest û ramanê azadîxwaz nayên çikandin. Tunekirina hestên azad, jiyana parsekî, tolaziya li ber derî ye. Ji bo wê jî hest û ramanê azadiyê nayên zeftkirin, mîna zêr in;di nav heriyê de, ne têne pelçiqandin ne jî têne windakirin.

Hest û ramanê azadiyê giyansivik in;mîna eşqê ne. Ne têne hilandin ne jî têne sekinandin, wekî ber in. Encama wan raperîn e. Raperîn rûmeta kesatî, heyîna xwe bi xwe ye… Ji vê jî tirs ji cihekî û pê de cesaret e, zilm jî ji serhildanê re sedem e.

Çûn! Serhildêr bûn ew!

Ji kirêtiyê dijmin hinavê wan şewitîn, hişê wan germ bû, dilê wan sotî bû. Verîşan, xwe hilweşandin û mîna şûrê li kezebê ketî xeleka mirinê ya derdora welatê xwe şikandin û çûn!

Bi destên vala,bi dilê tijî çûn!

Bi piyê tazî, bi destê hine, bi çavên kilkirîn, bi gustîlên tiliyê, bi tilîliyên berbûliyên bûkê…

> Ji kirêtiya dijmin hinavê wan şewitîn, hişê wan germ bû, dilê wan sotî bû. mîna şûrê li kezebê ketî xeleka mirinê ya derdora welatê xwe şikandin, ji sehera sibê ramanê azadiyê mêtin û bê xatir çûn!

bêheviyên vegerê, mirin mîna strekê bi eniyê xwe ve kirin,ji sehera sibê ramanê azadiyê mêtin û bê xatir çûn!

Ev hebûn lê hebûna wan û welatê wan bi zimanê çiroki diguhên wan de dihat nuharandin. Ew çirok çarna kuştina bavên wan bû,carna bidarvekirina birê wan,çarna birin û venegerîbûna apên wan, carna şewitandina zarokên wan, carna jî zikqelaştina dayikên wan bû. Êş, eşa di dilên wande mayî bû. Dîrok parzinîn.Li bin parzû dagirkerî bû; ji Îskenderê Zilqirneyn heya Hulagû, Tîmurleng, Şah Îsmaîl, Roma, Xalit Bîn Welîd û şûre wî, Osmanî û hwd…

Li ser parzû, ji Hurî heya Mîtanî, Kawa û Med, Zerdeşt û Manî di nav baxê Ronahiyê de diçirisandin. Babek, Yekdest, Botan, Nehrî, Geliyê Zîlan, Newala Qasaban, Palo, Dersim, Agirî û 33 gule…

Dakirkerî, di Kurdistanê de birîna reş bû!..

Birînê di nava birînê de hatibûn kolan xwê tijî bûn.

Ku êşê tahamûl derbaskir li ser qirika şûr jî be wê xwe lêxe û herê…

Hêvî parêzî, li derdora xwe reşandin. Giyana hişk bi bîna xwe, bi hilma xwe nimandin. Şitlê azadiyê çandin û bi tîrêjên rojê re hilkişiyan û çûn… Li her eniyê ye ew bûn. Prometheus li ba wan çîrok e, heqîqet ew bi xwe ne!

Ew rastîbûn cangoriyê mirovatiyê, ramanê azad; çar xetîreyên agir bûn di tarîtiya zindanê de, têkçûna teslimiyetê, şikandina deriyê welatê Hades bûn di deste Mazlum de. Beritan bûn, serbixwe, Zîlan bûn li Dêrsimê, heyfa Besê û Zarîfe…

Hinek ji wan bêşop, şopwinda bûn, li çiya di cengê de ketin, bêgor, winda bûn…

Ew çûn,taca dagirkeriyê a mirinê ji serê gelê xwe rakirin û gelê kurd vejandin.

Ew ronahiya çavê kurdan, ew gerîla bûn!

# Serpêhatiya axayekî îflas kirî

ADIL BAŞARAN

Di demekê de axakî îflas kiribû. Axayê îflas kiribû bi eslê xwe kurd bû. Wekî ku hûn jî pê dizanin di sosyolojiya kurdan de di bingeha wan de çav firehî heye. Ne çikûs î. Axa bi wî halê ku ketiyê pir pê xemgîn e û nema dizane ku ew ê çawa ji vê belengaziyê xilas bibe.

Axa gelekî diponije, difikire û digihêje encamekê bangî jina xwe dike û wiha dîbêje; "ji min re kincê qenc bîne." Jina wî dibêje; "çi bûye tê ji kincê nû çi bikî."

Axa dibêje; "xanim bi vî halê me ne ma diqede ez gelek fikirîm û ez gihîştim vê encamê"û wiha dom dike; "wekî tu jî pê dizanî ez seraf im ji ajalan, ji entîkeyan û ji însanan fêhm dikim. Ev xisûsiyetekî girîng e her kes pê nizane." Axa ji jina xwe re got; "ez ê qatê kincê xwe li xwe kim û tu bide pêşiya min û min bibe, mazat a koleyan bifiroşe û bihayê min jî bi sed zêrî bibêje, dema ji te re bêjîn çima tu ewqasî biha dibêjî, tê bêje mêrê min seraf im"

Li ser wê gotina axê jina wî gelekî aciz dibe û wiha dibêje; "ger em ji birçînan bimirin jî ez te nabim bi koletî nafiroşim." Axa dibêje; "xatûna min di orf û adetê me de dema jinek mêrê xwe bibe li mazata kola bifiroşe, yên bikire perê xwe dide û wî koleyî bi şûnde dide jina wî û azad dike."

Wiha dibêje: "Ma min gelekî kolê ku jina wan ew anîbûn kirîbûn û paşê min bi şûnde dida, li nav welatê me ev adet e. Tu bi yê min bike, ew zêrê ku tu bistîne em ê pê debara xwe bikin.

Axa jina xwe li ber meselê dixe, dibe serê sibehê qatê kincan li ser bejn û bala xwe de da dike. Dide bi dû jina xwe û diçin mazata koleyan. Axa yên ku hatinin bikerin tê û bazar dikin. Jina wî dibêje:" Mêrê min bi sed zêrî" dema dibêje bi sed zêrî kîjan axa tê û nakire. Piştî demekî axakî din tê û bazar dike, dema dibîne ku jina wî dibêje bi sed zêrî axa jê re dibirse, û wiha dibêje " koleyê herî biha bi deh zêra ye çima tu ewqasî biha dibêje." Jina wî wiha bersiva axayê hatiye mêrê wê bazar dike dide:"mêrê min ji kolan cudatire seraf e, serafê insanan ajalan û entîka ye." Dema wiha dibêje mêrê dikire, sed zêrî didiyê û wî dibe ber bi malê ve, jina wî dibîne ku mêrê wê bi şûnde nedan wê û ji mêrê xwe re wiha dibêje:" Ma te got adetê me de kes jina ku mêrê xwe bifroşe nabe ew ê perê bidin û paşê dîsa azad bike."

Axa ji jina xwe re dibêje: "Xatûna min tu miraq neke here malê ezê di demek nêz de werim." Jina wî sed zêrê xwe digre û bi xemgînî berê xwe dide malê.

Piştî demekî,axayê kole bi sed zêrî kirîbû diçe mazata kola. Li mazatê hespekî spehî yê firotinê jî anîbû mazatê. Dema diçe hespê bazar dike, xwediyê hespê "bihayê wê bi sed zêrî ye." Axa dipirse "çima tu ewqasî hespê biha dibêjî de ka bisekine kolekî minî seraf heye,bila were lê binêre ger ku bi ecibîne ez ê bistînim." Dişîne pê kolê xwe, kolê tê û li hespê dinêre, kole wiha dibêje "ev hespa ne dostê siwarê xwe ye dijminê xwediyê xwe ye. Li ser vê gotinê xwediyê hespê aciz dibe û dibêje " ev kolê te vira dike ne seraf e de bila pê derxe ezê hespê belaş bidim ger derewan bike hûnê sed zêrî bidin."

Axa şertê xwediyê hespê qebûl dike û ji kolê xwe re wiha dibêje." De ka wer hunera xwe pêşî me bike û fîêlê wî hespê derxe holê."

Kole dibêje "ev hespa dema dikeve şer ger ku dijmin bi şûnde vekişe ew jî bi şûnde vedigere û dema çav li avê dikeve xwe di nav avê de davêje erdê û dibe sebeba kuştina xwediye xwe, ger hûn bawer nekin ez dikarim derxînim holê." Kole jî li hespê suyar tê û yên din jî didin pê û diçin nava avê. Dema hesp dide nav avê xwe davêje erdê. Kole dibêje "ev bû yek ma yek. " Ez ê fîêlê hespê yê din jî derxim holê. Dema xwediye hespê dît ku bi rastî hespê xwe di nav avê de xwe avêt erdê hema di cî de got " min winda kir hewcedarî bi ya din tune." Axa pir kêfa wî hat û di dilê xwede got "kolê minî seraf ji min re belaş ma."

Piştî demeke din axa cardin diçe mazatê û li mazatê teyrekî baz yê firotine dibîne, diçe bihayê teyr ji xwediyê wî dipirse bihayê teyr bi deh zêra digot axa bangî kolê xwe dike. Kole tê û bala xwe dide teyr wiha dibêje "ev teyr ne hurre, sexte ye." Xwediyê teyr li ser vê gotina kole gelekî aciz dibe û wiha dibêje "ger ku ev teyr sexte be û pê derxe ezê bê pere bidim, ger ku teyrê min hurr be hûnê deh zêra bidin min." Her du teref jî vê bazarê qebûl dikin. Kolê seraf radihêje teyr û wiha dibêje "Ev teyr dema hêke ew birine xistine bine kurka mirîşkê û dibin wê de derxistiye ne dibin dayika xwe de ji ber ku hêk dibin mirîşkê de bûye çêlîk ji ber vê ne hurre." Xwediyê teyrê baz şaş dimîne û dibêje " raste tiştê kole dibêje bi tevahî wisa ye." Teyr dide axê gelekî pê keyf xweş dibe û diçin malê.

Axa gelek kêfa wî tê kolê wî bûye mîna tîcaretxanekî axa bangî kolê xwe dike û dipirse "te gotibû ez serafê însana me jî, de ka bêje ez însanekî çawa me, ji min re bêje." Kole wiha bersivê dide " raste ez pê dizanim ama şertê min jî heye tê sed zêrî bidî min û nanekî çêke bangî sed axa bikî. Di huzûra wan de ezê ji te re bêjim ku tu însanekî çawa yî ger tu van şêrtê min cîh nîne ez tiştekî nabêjim. Li ser vê bazara kole axa kelecanek têyê û ji bê çaretî şartan qebûl dike. Xwarinê çêdike û bangî sed heb axayî dike. Axa bi çocikan xwarin li mêvanan belav kir piştî mêvanan xwarin qedand û bangî kolê xwe kir û mesela xwe ji mêvanan re got.

Kole derket pêşberî cimaeta axayan û wiha got."ez sefîm ji bo ku ez bêjim axayê min însanekî çawa ye bazareka me heye lazime hûn jî bibin kefîl." Cimaeta axayan bi yek dengî qebûl kir kole got başe û wiha dom kir got "gelî cimaeta axayan ev axayê min ne dola bavê xwe ye." Li ser vê gotinê mîna ku tu ava kelandî bi ser cimaetê de dake deng nema ji kesî hat. Kole wiha axaftina xwe berdewam kir"gelî axayan ezê niha bêjim û hûn jî guhdar bikin di adetê me de dema jinek mêrê xwe bîne mazata kola bifroşe yê bikire cardin bi şûnde dide jina wî ama axayê min ez bi şûnde nedam ev delîlek ya din dema axayê min xwarin da we bi çocikê bela dikir ev di adetê me de tune ye ne usaye gelî axa yan." Cimaetê got raste van gotinê te wiha ye ama ji bo em baş pê zanibin ku ne ji me ye delîl lazime. Li ser vê xulam dibêje bangî pîra dayika axê bike bila were û rastiyê derkeve holê. Diçin bangî pîrê dikin û ji pîrê dipirsin îdea kî wisa heye de ka ji me re bêje berî ku tu biçe rahmetê. Ev kurê teye an na rast bêje.

Pîrê kelo girîbû û wiha got "dema ez û rehmetî li ber perê Derya Reş digeriyan me ew di nav pêçekê de li bin dara lîmonê digiriya me dît rehmetî çû rahişt pêçeka wî anî ji ber ku zarokê me jî tune bû me ew mezin kir û niha bûye axayekî kurdan. Bûye axa lê ew zarokê Tirka ye. Dema pîrê ev îtrafa kir axa ji erdê piloz bû bi çolê de ket û çû nema hat. Kole jî berê xwe da malê û cimaeta axayan belav bû. Pistî vê bûye re axayan çi kolê wan hebû ew azad dikirin. Bi vê minasebetê koledarî ji ortê rabû Azadî çê bûbû.

## Qerf Henek

### Reco li ser kurdî 'Mahalle Baskisi' dike




### Pênûsa kurdî dê bi kurdî xêz bikin




www.arsivakurdi.org

# Çîroka 20 salan a vejîna çandeke nû

Navenda Çanda Mezopotamyayê di demeke zext û zordariyên herî dijwar ku li ser kurdan û çanda wan pêk dihat hate avakirin. NÇM'ê niha 20'emîn salvegera xwe pîroz dike

STENBOL / DÎHA - Navenda Çanda Mezopotamyayê di demeke zext û zordariyên herî dijwar ku li ser kurdan û çanda wan pêk dihat hate avakirin 20 sal li pey xwe hiştin. NÇM'ê 20'emîn salvegera xwe pîroz dike. NÇM, ku di qadên muzîk, şano, sînema û dansê de xebatan dimeşîne armanc dike ku xebatên mezintir bimeşîne.

Navenda Çandê ya Mezopotamyayê (NÇM) 20'emîn salvegera xwe pîroz dike. NÇM, di bin banê xebatên xwe de gelek hunermend, komên mûzîkê, ekîbên şanoyê, sînama û komên dansê avakirin û afirandin. NÇM'ê di qada çandê de jî ji civak kurd re xebatên gelek watedar û girîng pêk anîn. Dema ku NÇM hate avakirin li Tirkiyeyê pêvajoya herî zêde li ser kurdan zext û zordarî pêkdihatin, hate avakirin û saziyê jî mafê xwe ji van pêkutiyan girt. Di salên 1990'î de kontr-gerîlla û JÎTEM'ê li aliyekî bûyerên kiryar nediyar pêkdianîn û li aliyê din karsazên kurd û hunermendên kurd direvandin û qetildikirin. Di nav hedefên van hêzên tarî de NÇM jî hebû û rastî gelek zext û zordariyan hatin. Xebatên wê hatin astengkirin, album, fîlmên sînamayê û pirtûkên derxistin hemû hatin komkirin û qedexe danîn ser. Li ser hemû zextan xebatkarên saziyê ji ramana xwe ya alternatîf tu tawîz nedan û rastî êrîşên gelek dijwar hatin.

Li gel van hemû zextan xebatkarên NÇM'ê di demekî kin de bi tarzê xwe yê mûzîkê hem di nav civaka kurd de hem jî di nav civaka Tirkiyeyê de daxa xwe li 20 salên dawî da. NÇM'ê di bin banê xwe de Koma Çiya, Koma Berxwedan, Koma Agîrê Jiyan û gelek komên din avakirin ji mîrateyê çanda kurdan a dewlemend fêde girt.

**Qedexe rakir**

Di vê demê de berhemên nivîskî yên wêje û hunerê hatin derxistin û her wiha pirtûk, berhemên şanoyê, komên dansê û berhemên têkildarî zimanê kurdî da hatin nivîsandin û bi gel re hatin cem hev. Ji ber



zextên li ser gelê kurd xebatên saziyê kirin rastî eleqeyekî mezin hat. Di demekî di civaka kurd de axaftina kurdî qedexebû xebatekî wisa di her alî de di nava civaka kurd de rastî eleqeyekî mezin hat.

Solistê Koma Agirê Jiyan Alî Geçimlî, diyar kir ku NÇM'ê bi bedelên gelek mezin heta îro hat û dê NÇM helwesta xwe ya alternafî bidomîne. Geçimlî, anî ziman ku xebatkarên NÇM'ê gelek zehmetî û zordarî kişandin û wiha got: "Em li hemberî zext û zordariyan hatin. Demekî wisa hat ev yek bi canê xwe dan. Hinek jî li vir ji ber zordariyan derketin derveyî welat. Hinek derketin çiyayan.

Minakên min hejmartî jî nîşan dide ku xebatên saziyê di kîjan şertan de hatine kirin. Me xwest ku em hunera hemû gelên li Mezopotamyayê dijîn yên wekî suryanî, erep, keldaniyan çêbikin. Lê ji ber zextên li ser me û kêmasiyên me, me ev yek pêk neanî."

Geçimlî, da zanîn ku Hidir Çelik û Hogir bi canê xwe bedela van xebatan da.


Ergîn Çelik


Alî Geçimlî

**'Xebatên me dê fireh bibe'**

Xebatkarê NÇM'ê Ergîn Çelik jî diyar kir ku xebatên wan dê di 20'emîn salvegera saziyê de hêj berfirehtir bibin û bidomin.



## Ji Şaredariya Yenîşehrê ji bo zarokan pirtûka kurdî û tirkî

AMED- Şaredariya Yenîşehîrê ya Amedê jo bo zarokên pola amadekariyê pirtûka boyaxkirinê ya ku bi kurdî û tirkî hatiye amadekirin belav kir. Her wiha şaredariyê ev pirtûk bê pere li zarokan belav kir.

Şaredariya Yenîşehîrê ji bo zarokê pola amadekariyê pirtûkek bi kurdî û tirkî amade kir û li xwendekaran belav kir. Pirtûk li hemû polên amadekariyê yên di nava sinorên Yenîşehîrê de bûn hatin belavkirin. Ligel pirtûk pênûsên rengîn jî hatin belavkirin. Li dibistanên wekî 24 Kasim, Seyrantepe, Ferît Koşk û Şehîtlikê hatin belavkirin. Şaredarê Yenîşehîrê Selîm Kurbanoglu û Serokê Egîtîm Sen'a Amedê Abdullah Karahan bi hev re pirtûk belavkirin. Di dema belavkirina pirtûkê de gelek zarokên pola amadekariyê bi tirkî nizanîbûn û li ser vê yekê Kurbanoglu bi zarokan re kurdî axivî. Kurbanoglu diyar kir ku divê zimanê perwerdehiyê dîsa jî nûve di asta zagonî de bê nîqaşkirin.

**'Zarok kurdî baştir diaxivin'**

Kurbanoglu der barê amadekariya pirtûkê de axivî û diyar kir ku îsal li Yenîşehîrê bi giştî 3 hezar û 200 zarok dest bi pola amadekariyê kirine û got ku hedefa wan ew e ku xwe bigihînin hemû zarokan. Kurbanoglu wiha got: "Me xwest ku em vê diyariya rengîn ku dê pêşeroja zarokan me bi xemilîne li zarokan belav bikin. Lê me tiştekî din jî li vir dît. Zarokên ku nû dest pê kirine di axaftina tirkî de zehmetiyan dikişînin. Lê bi zimanê kurdî baştir diaxivin. Ev yek jî dide xuyakirin ku dê zarok baştir bi serbikevin." Kurbanoglu pirsgirêkên midûrên dibistanan jî guhdarî kir. Midûrên dibistanan jî daxwaz kirin ku hawirdor bi awayekî rêk û pêk bên sazkirin.

Piştî vê Kurbanoglu pirtûk li zarokan belav kirin û navên wêneyan jî bi kurdî û tirkî htin xwendin.

Serokê Egîtîm Sen'a Amedê Abdullah Karan jî diyar kir ku di amadekariya vê pirtûkê de piştgiriya şaredariyê gelek zêdeb bûye û got ku şaredarî li gel xebatên rûtîn ji bo perwerdehiyê jî butçeyê vediqetîne.

## Ji Yuksel Yavuz awazên Stenbolê

ALÎ GULER / ANF - BERLÎN

Derhênerê belgefîlma bi navê 'Close Up Kurdistan' Yuksel Yavuz, vê carê jî gelên ku li Stenbolê dijîn, derdixe pêşberî temaşevanan. Di belgefîlma bi navê 'Awazên Stenbolê' de muzîka kurd, ermenî, romen, yahudî, rum û ermenî balê dikişîne. Her wiha Yavuz nêzîkatiya li hemberî van gelan jî di belgefîl de bi awayekî vekirî derdixe pêş.

Derhênerê kurd Yuksel Yavuz belgefîlmekî nû yê bi navê 'Awazên Stenbolê' kişand. Yavuz di belgefîlmê de mijarên hemû jiyana gelên Stenbolê digire dest. Derhêner bi kameraya xwe çûye cihên ku hatine ji bîrkirin û tirs, fikar û nerehetiya ku ermenî, kurd, yahudî û rûm di nav de ne, nîşanê me dide.

Yuksel Yavuz ji Tarla Başi û Sulu Kuleyê gelek dîmenên bi keder bi dest xistiye. Di şexsên komên muzîkê yên van gelan de, ligel vegotina jiyana wan di belgefîlm de dem bi dem awazên ku di cihên hatine terkkirin de tên gotin jî cih digire.

Gotinên wekî; Yahudî; Em ji tirsan navên xwe vedişêrin, Ermenî; Em li benda roja xwe ya derkirinê ne…. Rum; Haya wan ji vê dewlemendiyê tune ye… Romen; Em ji Sulu Kuleyê tên surgunkirin… û Kurd; em mexdurên şerê 30 salî ne.. di belgefîlmê de xwe dide der.

Belgefîlm hinekî di tehma muzîkalê de hatiye çêkirin. Bi 5 zimanî û bi terz û cihên cuda de stran hatine gotin.

Dema mirov fîlm temaşe bikin fîlmê Bahman Ghobdî yê ku li Cannesê hate nîşandan ê bi navê 'Kasî Az Gorbehaye Îranî Khabar Nadareh' (Kes behsa pisîkên Îranê nake' bi bîra mirovan dixe.

**Xwest cudahiyan nîşan bide**

Yuksel Yavuz der barê belgefîlma xwe ya nû de axivî û diyar kir ku dema ku wî belgefîlma Close Up Kurdistan dikişand, ev belgefîlm ketiye hişê wî. Yavuz anî ziman ku mirov dema ku li Stenbolê mêze dikin Stenbol îsal paytexta çandê ya Ewropayê ye. Yavuz wiha dirêjî da axaftin xwe: "Gelek şahî û berhemên wisa tên çêkirin. Min jî vê belgefîlmê kişand. Min hewl da ku ez jiyana van gelan derxinîm pêş. Min rewşa wan nîşan da. Bi terzeke rexnekirî. Dema min ev çêkir jî min bi terzeke klasîk çênekir. Min muzîka kurd, ermenî, yahudî, romen û ruman di şexsê wan de vegot. Çimkî muzîk, dîrok, ziman û çanda gelekî ye. Ev hemû xwe di muzîkê de dide der. Ji ber wê min jî muzîk bikaranî."

Yavuzgot gelên ku bûne mijara belgefîlm li Stenbolê di bin şert û mercên dijwar de dijîn û wiha got: "Bi rastî jî ev gelana di bin şertên ne baş de dijîn. Mînak rum gelê herî kevn yê Stenbolê ne. Lê niha qediyane. Mînak sel sal berê nifûsa ruman li Stenbolê 180 hezar bû. Lê îro 2 hezare. Wê demê nifûsa Stenbolê mîlyonek bû. Niha 15 mîlyone. Yahudî 500 sal berê li vir bi cih bûne. Niha ew jî hindik mane. Ermenî jî bi vî rengî. Komeleyên wan hemû veşartine. Cihên îbadetê di cihên veşartî de ne. Rewşa gelên din jî bi vî rengî ne." Belgefîlm 58 deqeyan berdewam dike û di 30'yê îlone de di televîyona alman û fransizan ARTE'yê de bê nîşandan.



## Weşaneke nû ji Enstituya Kurdî ya Brukselê

BRUKSEL- Çend siyasetmedarên flaman di salên 60'î de dest bi nasîna pirsgirêka kurdan kir. Ev mijara ku çend kes pê radibûn çil sal piştre ne tiştekî nenaskirî ye. Keda gelek siyasetmedarên flaman di vê yekê de mezin e. Pirsgirêka kurdan li Belçîka êdî ne 'serê min jê çi diêşê' ye.

Bi teybetî paş bomberanên gazê yên li ser Helebçeyê û derdorê wê û bi sedhezaran penaberên ku di şertên giran de li hawîrdoran belavbûn. Ji wan penaberan beşek jî xwe gihandin Ewropayê.Rojhilat, rojava û başûrê Kurdistanê demên zor jiyan. Her roja diçe zêdetir penaber têne ber bi Ewropayê de.

Ewropiyan kurd û pirsgirêka wan roj bi roj û rû bi rû didît. In de Bres voor de Koerden (Ji bo kurdan di meydana xebatê de) li ser xebat, çalakî, peywendî û mafên bingehîn ji bo kurdan ji aliyê siyasetmedarên flaman hatiye nivîsîn.

Bi riya hevpeyvîn bi kesên ev xebat kiriye, armanca wan, peywendiyên wan bi rayedarên Ewropo, Tirkiye, Iraq, Îran, Sûriye, welatên din û bi kurdan re, li ser esasê dokumentên wan di vî warî de hatiye nivîsîn. Wan ji bo vê xebatê çi kiriye, çawa kar domandine, çi jiyane, çi winda kirine û çi bidest xistine tev hatiye nivîsîn.

Bi vê pirtûkê em dîtinên wan siyasetmedaran li ser dîroka xebata wan ji bo kurdan guhdarî dikin û bîr û baweriya wan li ser paşeroja kurdan jî dibînin. Tirkiye li ber deriyê YE ye. Pirsgirêka kurdan û giraniya xebata kurdan ji bo wî welatî çiqasî mezin e ku tesîrê li erê-na kirina vê daxwazê bike? Ewropî di vê mijarê de çiqasî xwedî prensîb in?

Hevpeyvîn bi kesên mîna Willy Kuijpers, Jaak Vandemeulebroucke, Frieda Brepoels, Bart Staes, Jû gelek kesên din re, ji bo vê pirtûkê çêbûn.

www.arsivakurdi.org

Rupel 12 kurdi:Layout 1 28.09.2010 15:02 Page 1

# Azadiya Welat

## Bi dema weşana nû

**1 Cotmeh**

**Li bayiyan e**

- Bi krîtîkên pirtûk û sînemayê
- Bi lêkolîn û dosyayên taybet ên çandî
- Bi quncikê tenduristiyê
- Ji Neolîtîkê heta roja îro dîroka Kurdistanê
- Ligel nivîskarên xwe bi hin nivîskarên nû; Şerefxan Cizîrî, Dîlan Aydin, Rotînda Yetkîner, Mihemed Ronahî, Mazhar Gunbat, Dr. Remzî Azîzoglu, Mehmet Şahîn, Memed Drewş, Ronî War, Abdulkerîm Bîngol, Xelîl Xemgîn...
















**Rojnameya we ya tekane rojane û kurdî Azadiya Welat ji bayiyan bistînin...**

www.arsivakurdi.org